



## 'Min bawer nedîkîr ez van rojan bibînîm'

Rûpel 8-9

Nûnerê KMM'ê ya Deryaspî Metin Çelik:  
Qetlîama Küçükdikiliyê  
rûreşîya dewletê ye

Rûpel 4-5

Ji bo Roja Aştiyê  
Amadekariya  
"şerê" aştîyê!..

Rûpel 3

Robîn Rewşen:  
Abiyayîşê  
Televîzyonê Medî

Rûpel 15

# NAVEROK



7

Rahmi Batur: Dilê kurdan ji salhameyan sar e



10

Dildar Şeko: Bilbilê şeyda: Evdirehman Mizûrî



13

Kurudo no hoshi an "Stêra Kurdan"

## Ji Xwendevanan

**BI RASTÎ** ji bo hînbûna zimanê kurdî Rojnameya Azadiya Welat cihekî girîng digire û rîstêke mezin dilîze. Lê tenê giraniyê nade û mijarê divê ku hinekî li ser bûyerên ku li welat dibin, binivîsîne. Em hêvîdar in ku Azadiya Welat ve pêşniyaza me li ber çav bigire. Bi rastî jî em pir dixwazin zimanê xwe yê neteweyî bi xweşî hînbibin. Lê mixabin ne pirtûkên gramera kurdî li ba me hene û ne jî pirtûkên bi zimanê kurdî li gorî ku tê xwestin, hene.

MEHMET SANCAK BARTIN

**EZ** xortekî bîst salî me û ez ji Kurdistanê ji bajarê Mûşê me û ez niha lê Tirkîyeyê li bajarê Aydinê dimînim. Ji ber ku gundê me jî aliyê dewleta tirk ve hatiye şewitandin em niha li vir dimînin, malbata me du bira ne. Dayika me jî heye û bavê min girtiye ji 1996 û bi vir ve di Girtîgeha Amedê de ye. diwazdeh sal ceza danê û ew şandin Girtîgeha Tirabzonê.

Daxwazê min heye ku hûn rojnameya Azadiya Welat rûpelên wî zêdetir bikin û cih bidine stranên şervanên serê çiya ez bi bawerim im ku rojnameya me hin bêhtir xweş bibe, çûnkî Azadiya Welat azadiya gelan e.

ZEKÎ BAYSOK



# Aştî

MEHMET GEMSİZ

**D** i 1'ê rezberê de 'Roja Aştîyê ya Dinyayê' tê pîrozkirin. Ji ber vê yekê, li Tirkîyeyê, li welatê me jî bi çalakîyên cur bi cur wê pîrozbahî bîne lidarxistin. Ev çalakî ji aliyê partî, rêxistin, sendîka û sazîyên demokratîk ve tên kirin.

Armanca wan ew e ku gawek beriya gawekê dawî li şerê qirêjî bînin û biriya diyalogê mesele bê çareserkirin.

Encama wî şerê taybet ji her kesî re diyar e.

Dewlet, ev sêzdeh sal e ku li ser çareserîya leşkerî îsar dike.

Ji ber vê îsârê bi deh hezaran kuştî, li serîya sê hezarî gundên şewitandî û valakirî, ji sê milyonî zêdetir kesên ku ji av û aqarên xwe hatine dûrxistin, daristanên şewitandî, "cinayetên kiryar nediyar", "wîndayên di binçavan de", hebakirina kanên aborî û hwd. derketin meydanê.

Ji aliyê din ve, bangên aştîyê ji hêla

tevgera azadiya kurd ve, îlankirina agirbestan...

Tenê, bi van tespîtan jî xuya dibê ku kî aştîxwaz û kî jî şerxwaz e.

Li vê cografîyê karê aştîxwazan ji yê şerxwazan zortir e. Ji ber ku, di ferhengê şerxwazan de peyva aştîyê nîn e. Îdeolojîya vê dewletê ne li ser aştî, biratî û wekhevîyê hatiye danîn.

Ew hîna jî, ji hespên xwe peyva rîsbûnê û şûrê wan di destê wan de ne. Dirûşma: "Ji Deryaya Adriyatîkê heta bi Seda Çînê, alema tirkîtiyê ye" delîla vê yekê ye.

Dagirkerî, îşgalî, talankerî karektera wan e, ruhê nijdevaniya wan hîna zindî ye. Tu tiştî jî xwe wînda û berze nekirine.

Ka hema em dêhna xwe bîdîne, ji Osmanîyan heta bi roja îro, bîyî şer û pevçûn lihevhatîneke wan qewimiye gelo?

Me di serî de jî got. Di ferhengê wan de peyva aştîyê nîn e. An serketin heye,

an jî binketin. Jixwe, çaxa bi ser dikevin bi ,an li hemberî xwe re jî li hev nayên. Eger têk biçin, aştîyê, lihevhatîna dixwazin.

Bala xwe bidîne, ev bîst û du sal in ku meseleya Qibrîsê hel nebûye. Aştî li wê giravê pêk nehatiye.

Îro dinyaya pêşkeftî, dinyaya şareza afgirê aştîyê ye, afgirê gotûbêj û diyalogê ye, dixwaze ku hemû nakokî û ihtîlaf bêyî şer, bi xweşîkahî çareser bibin.

Lê yên ku aqilê wan ne di serê wan de, di çavên wan de rîe, ji vê yekê fêm nakin. Ji ber ku ew hîna jî li ser guhê berê, radîzên, bi zihniyeta hoveber û kevnare ku edî kufikî bûye tevdirgerin. Li gorî qaydeyên berê diçin. Şêla wan ev e.

Bawerîya me ew e ku di dawiyê de jî wê aştîxwaz bi ser bikevin. Pirêzeyên çîhana me ya kevnare ve didine nîşan.

Divê em li ser wê şer û cengê jî rawestin. Yek jê neheq e, tu rewabûna (mesrûbûna) wî nîn e. A din jî mafdar e, rewaye û jî bo xweparêziyê ye. Ew jî pîroz e.

Emî bi gotîneke me kurdan dawî li nivîşê xwe bînin:

Sirke çiqas ar be, denê xwe diterikîne.

# Azadiya jinên kurd bi şer gengaz e

RECEP AKAMIŞ

**A** zadbûna jinan, azadbûna civakê ye; serxwebûn û rêxistîbûna jinan, serxwebûn û rêxistîbûna civakê ye. Ji ber ku jin û jiyân, jin û civak bi hev ve hatine kelijandin. Jin di civakê de cihekî taybet û girîng distîne. Ew rewş jî, bi xwezayî bandora jinan li ser civakê zêde dike. Di guhartin û nûbûna civakê de jin rîstêke mezin dilîze. Lewre ew çiqas bibe xwediyê hêzeke rêxistinî, di warê leşkerî, aborî, politîka û çandî de bi pêş ve biçê, ew ças mercên guhertîna civakê zû pêk tên.

Belê, di dîrokê de gelek şoreşên cur bi cur çêbûne. Her çiqas jinan di wan şoreşan de cih girtîbin jî, lê tu car bi bîngêhî pîrsgirêka jinan çareser nebûye. Ji ber ku wan şoreşan jin nekîrîne xwedî nasnameyêke azad, nekîrîne xwedî hêzeke serbixwe.

Îro ev rewşa jinan di tevgera azadiyê de bi rengekî xurt tê dîtîn û ji bo çareserkirina pîrsgirêka jinan gavên mezin hatine avêtin. Di destpêkê de tevgera azadiyê bi kûrahî cihekî girîng û mezin daye jinan. Bi vî yekê tenê nemaye, di nav tîkoşîna şoreşê de gelek berpirsî daye jinan. Ev nîrxên ku ji bo azadiya jinan derketine holê, bi hêsanî çênebûne. Ji bo ku em van pêşketinan baş fêhm bikin, pêwîst e ku em rewşa jinên Kurdistana'ê çawa bû, bi kurtî bidin nîşan.

Civaka kurd ji ber ku her dem di bin bandora dagirkerîyan biyan de maye, tu car bi hêz û vîna xwe ya azad tevger nekîrîye. Di warê konevanî, leşkerî,

**Ji ber vî lawazbûna civaka Kurdistanê, dijmin her dem bi malbatê û jinan xwestiyê gel bixîne. Di vî alî de jî dijmin gelek serkeftî jî bûye. Rastiyêke wer derketiyê holê ku çareserkirina pîrsgirêka jinan, çareserkirina kesîtiya mîrê kurd, civaka kurd e.**

çandî, aborî û hwd. de nebûye xwedî hêzeke serbixwe. Ji ber vî yekê jî, civaka kurd di nav xwe de girtî maye. Ev rewş jî, bûye sedema dûrketîna ji şaris-taniyê.

Di wê civaka girtî de çînên nûjen jî derketine. Çawa ku mîrê kurd ji nasname û keda xwe dûr ketiye û li hemberî nîrxên netewe ya xwe biyan maye û bûye kole, jî wê rewşa civakê jinan jî bi du alî para xwe girtine. Yanê jinên kurd jî hêlekê ve di bin bandora dagirkeran de maye, ji hêla din ve jî di bin pesta mîran de maye. Vê rewşê jî, jin kîrîne kolyê kolyan.

Bi çavên navgînan li jinan hatiye mezkirin. Tu rîstek nedane wan. Ramana wan û jiyana wan jî bilî ya malbatî ne tiştêk bûye. Ji ber vî lawazbûna civaka Kurdistanê, dijmin her dem bi malbatê û jinan xwestiyê gel bixîne. Di vî alî de jî dijmin gelek serkeftî jî bûye. Bi jinan şexsiyeta mîrên kurd jî xistinê.

Rastiyêke wer derketîbû holê ku çareserkirina pîrsgirêka jinan, çareserkirina kesîtiya mîrê kurd, civaka kurd bû. Ji bo vî yekê jî tevgera azadiyê, çareserkirina şoreşê, ançax bi çareserkirina jinan gengaz dît. Ji bo vî rastiyê jî bi giranî li ser pîrsgirêkê û kesîtiya jinan sekinî.

Çawa ku berîka yekemîna a 15'ê Ge-

lawejê jî bo gelê kurd bû vejin û destpêka jiyaneke nû, ji bo jinên kurd jî bû mîzgîna rîya azadiyê. Jinên kurd xwe ji nû ve nas kir, "Ez kî me, nasnameya min çi ye, di nava tîkoşîna şoreşê de rîsta min çi ye?" Pîrsên wîha jî xwe kirin. Ji wê demê û bi şûn de jinên kurd, ketin nava lêgerînekê, di dawîya lêgerîna xwe de ew rastî dît ku jî xeynî şerê çekdarî ne gengaz e ku bibe xwedî rûmet û kesaniya xwe nas bike. Çawa ku serokatî jî dibêje:

"Azadiya jinan ançax bi şer tê qezenckirin".

Bi rastî jî, ne ev şerê azadiyê be, jinên kurd tu car nabin xwediyê vîneke serbixwe û jiyaneke bi rûmet.

Eger îro jinên kurd di nava civakê de bûye xwediyê rîstêkê û cihekî girîng girtîbe, ev lehengî di nava şerê azadiyê de hatiye afirandin.

Berî her tiştî ev bilîndiya jinan bîngêha xwe ji bîrdoz û konevaniya tevgera azadiyê digire. Ev bîrdoziya hemdemî bi xwe re ramaneke nû derdixe holê.

Ji ber vî yekê şerê azadiyê di şexsiyeta ketî û bêrûmet de lehengê mîna Bêrvan, Bêritan û Zilanê derdixe holê. Di nav tevgera azadiyê de jinên kurd îro dibê xwedî artêş û vîna xwe ya azad, di refên gerîla de cihên xwe digîre.



**LI STOCKHOLMÉ** Enstîtuya Kurdî vebû. Xebat û çalakîyên kurdan ên li paytexta Swêdê encam dan û niha gihîştin asta vekirina enstîtuyekê. Enstîtuya Stockholmê di 14'ê rezberê de ji aliyê Serokê Enstîtuya Berlînhê İsmet Şerîf Wanlî ve bi beşdariya gelek rewşenbîrên kurdî û dostên kurdan ve vebe.

Li gorî daxuyaniya rayedarên enstîtuyê, piştî vebûna enstîtuyê wê xebatên akademîk ên li ser çand û dîroka kurdan hê bi lez û bez û bi rêk û pêk çêbin. Xebatên ku berê bi destê kesên dihatê kirin êdî wê di bin banê Enstîtuyê de çêbe. Tê gotin ku wê serokatiya Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê Mamosta Amed Tigrîs bike.



**LI GORÎ ZAGONEKE** ku wê li Kurdistanê cihê zagona rêveberîya ne-asayî bigire, êdî wê hêzên dewletê karibin hêsanlîr mirovan bikujin. Di vê zagonê de tê gotin ku hêzên dewletê wê karibin bîyî banga "xwe bispêrin!" kes û hêzên çekdar gulebaran bikin.

Ev qanûna ku wekî paketeka demokratîk hatibû pêşkêşkirin, rayeya walyê herêma dide walyên hemû bajarên Kurdistanê. Di zagonê de ji bo çekên cerdevanan efû cih digire. Li gorî vê zagonê wê rêveberîya ne-asayî di 15'ê sermawezê de ji holê rabe. Xalên wekî televîzyona kurdî û mafê pêşvebirina çanda kurdî di zagonê de cih negirtin.

## NÛÇE

# Amadekariya "şerê" aştîyê!..

**Li gorî daxuyaniyan, wê "şahiya" aştîyê li Tirkîyeyê zû dest pê bike û wê dereng biqede. Na, li gorî daxuyaniyên partî û rêxistinên aştîxwaz, heta ku li welat xwîna ku dirije bê sekinandin, wê ev çalakî neqedin û aştîxwaz her ku here wê xebata xwe xurtir bikin. Ji ber ku ji deh salan zêdetir e li vî welatî şer heye, aştîxwaz jî amadekariya "şerê" aştîyê dikin.**



**D**i 1'ê rezbera sala 1939'an de ku Hitler ferman da û artêşa Almanya êrîş bir ser Polonyayê, 'Cenga Cîhanê ya Duyemîn' jî dest pê kir. Di vî şerî de tenê ji Yekîtiya Sovyetan a kevin li dora bîst milyon insan hatin kuştin. Dîsa ji gelek mîletan bi milyon insan hatin kuştin. Di dawiyê de hêzên Hitler şikestin û 'Hêzên Mutefîk' bi ser ketin.

Piştî ku şer qediya Neteweyên Yekbûyî, ji bo ku careke din bûyerên bi vî rengî neqewimin, roja ku almanan êrîş biribû ser Polonyayê, yanê roja 1'ê rezberê kirin "Roja Aştîyê ya Dinyayê".

### Li Tirkîyeyê wê zû dest pê bike û wê dereng biqede

Li gorî daxuyaniyan wê "şahiya" aştîyê li Tirkîyeyê zû dest pê bike û wê dereng biqede. Na, li gorî daxuyaniyên partî û rêxistinên aştîxwaz, heta ku li welat xwîna ku dirije bê sekinandin, wê ev çalakî neqedin û aştîxwaz her ku here wê xebata xwe xurtir bikin. Ji ber ku ji deh salan zêdetir e li vî welatî şer heye, aştîxwaz jî amadekariya "şerê" aştîyê dikin.

Çalakîyên aştîyê wê bi alikariya HA-DEP, DBP, İHD, KESK, ÖDP, SİNE-SEN'ê û di bin organîzasyona Ko-

ma Xebatê ya "Ji bo Aştîyê bi hev re"yê ve roja şemiyê, li Taksimê li ber AKM'ê bi "Zincîra Aştîyê" dest pê bike û wê heta 15'ê rezberê bi çalakîyên cur bi cur dewam bike.

Roja şemiyê civîna "Ji bo Aştîyê bi hev re" ya duyemîn wê li AKM'ê li dar bikeve. Di eynî rojê de wê konvoya aştîyê hem li bejê û hem jî li behrê bigere.

**1'ê rezberê:** Wê li Yedikule Zindanan bi navê "Pêşî bila çek bisekinin" şahîya aştîyê çêbibe. Di vê şahîyê de Edip Akbayram, Ferhat Tunç, Bulutsuzluk Özlemî û Ezginin Günlüğü wê stranên aştîyê bibêjin, pêşangehên ji bo aştîyê, li ser aştîyê sînevîzyon, palyaço, govendên gelêrî, kursiya aştîyê û gelek çalakîyên bi vî rengî...

Êvarê saet ji 20.00'an heta 21.30'an wê li AKM'yê bi navê "Merasîma 1'ê rezberê Roja Aştîyê ya Dinyayê" şevkê çêbibe. Wê program bi axaftina nivîskarê navdar Yaşar Kemal dest pê bike. Reha İsvan, Cem Özdemir û Mehmet Metiner jî wê ji bo aştîyê mesajên sembolîk bidin. Li ser 1'ê rezbera 1995'an û heta îro li ser şerên ku derketine û li ser xebatên aştîxwaz wê bi vîdeoyan dimen werin pêşkêşkirin. Her wiha jî wê helbest û stranên li ser aştîyê ji aliyê hunermendên navdar ve werin gotin.

**2'ê rezberê:** Li Beksavê bi navê şîr,

hevpeyvîn û îmze "aşî û şîr", çalakîyek wê bi beşdariya Vecihi Timuroğlu, Sezai Sarioğlu, Şükrü Erbaş, Mustafa Köz, Hasan Kıyafet, Özcan Sapan, İ. Kemal Karadayı, Elif Sorgun, Sennur Sezer, Cengiz Gündoğdu, Berrin Tay, Hüseyin Topçu, Ahmet Soner û Suna Aras, li dar bikeve.

**5'ê rezberê:** Li Bilsakê bi beşdariya du heykeltraşên Ukraynayî li ser mijara "Di aştîya dinyayê de talûkeya nukleer", wê dia werin nişandan û sohbet pêk werin.

**7'ê rezberê:** Li ser mijara "Aştî û Zarokên Sikakan", li Bilsakê panelek wê li dar bikeve.

**8'ê rezberê:** Li 'Maçka Demokrasi Parkı', wê 'Bazdana ji bo aştîyê' pêk were.

Di navbera 10 û 15'ê rezberê de jî wê 'Festîvala Aştîyê ya Sarıyerê' çêbe. Yanê ev festîval wê di 6 rojan de li hin taxên Sarıyerê çêbe:

**10'ê rezberê 1996, sêşem, saet:** 19.00, li Taxa Poligonê

**11'ê rezberê 1996, çarşem, saet:** 19.00, li Taxa Rumeli Hisarüstü

**12'ê rezberê 1996, pêncşem, saet:** 19.00, li Taxa Dağevleri

**13'ê rezberê 1996, in, saet:** 19.00, li Taxa Cumhuriyet

**14'ê rezberê 1996, yekşem, saet:**

19.00, li Taxa Büyükdere  
15'ê rezberê 1996, duşem, saet:  
19.00, li Kale

### LI BAJARÊ EDENEYÊ:

1'ê rezberê, saet di yekan de çalakîyên aştîxwazî bi daxuyaniya çapemeniyê li Parka İnönü dest pê dîke. 2'ê rezberê, li İHD'yê saet di 11'an de wê pêşangeha wêneyên aştîxwaziyê vebe. Wê 4'ê rezberê, li Müzikhola Şirin saet di 3'an de bi beşdariya Sedat Yurtdaş, Hüsnü Öndül, Sabri Topçu û Metin Çulhaoglu panel çêbibe. 5'ê rezberê, li Tiyatroya Mimar Sinanê saet di 6'an de bi beşdariya hunermend Ferhat Tunç, Nilüfer Akbal, ji NCM'ê Koma Zarokan û komên folklorê wê şahîya aşî û biratîyê çêbibe. Û di 8'ê rezberê de jî, çalakîyên aştîyê bi mitînga aşî û biratîyê diqede. Miting wê saet di 11'an de li Kavşaxa nexweşxaneyan dest pê bike, heta meydana İstasyonê.

Li Mersînê jî di 7'ê rezberê de li meydana Cumhuriyetê wê ji bo aştîyê mitîngêk çêbibe. Di 1'ê rezberê de li Antakyayê jî 'Şahiya aşî, biratî û kedê' wê çêbibe. Dîsa li İskenderûnê jî wê di 31'ê gelawêjê de wê aştîxwaz şahîyekî çêbikin.

AZADIYA WELAT/  
STENBOL, EDENE

Ji Koma Aştiyê, Nûnerê Herêma Deryaspî yê KMM'ê Metin Çelik:

# Qetlîma Küçükdikiliyê

## rûreşîya dewletê ye

**“Qetlîam rasterast ji aliyê polisên dewletê ve hatiye kirin. Kuştina amirekî polîsan, îmhakirina kesên di malê de nikare mafdar nîşan bide. Di vê bûyerê de, dewletê ev yek kiriye û zarok jî qetil kirine. Dema vê yekê dike jî, hêstirên malbatên leşker û polisên ku têne kuştin, ji emelên xwe yên qirêj re dike hacet. Li hêla din, guh nadin êş û azarên malbatên bi dehan gerîlayan ku nikarin herin ser cesedên zarokên xwe û wan veşêrin.”**



METİN ÇELİK

Wekî tê zanîn, di 8'ê gelawêjê de li Küçükdikiliya Edeneyê ji hêla hêzên dewletê ve înfazê bê-daraz hatibû kirin. Di encama vê înfazê de, dido ji wan zarok, 5 kes hatibûn kuştin, amirekî polîsan jî bi navê M. Nuri Kocabiyik hatibû kuştin. Navê wan kesên ku hatine kuştin Ömer Bayram, Rıdvan Altun, Abdurrahman Sarı, Berivan û Dilan bû, kewaniya malê Yeter Kaplan bi birîneke xedar ji mirinê filitî.

Ji bo ku lêkolînê di cihê bûyerê de bike, “Koma Aştiyê” hate herêmê. Di komê de kesên mîna Rojnamevan Celal Başlangıç, Parlementerê Alman ji Partiya Keskan İsmail Koşan, ji TOHAV'ê Ebûqat Naciye Kaplan, ji HADEP'ê Parlementerê Bijartî yê Batmanê M. Salih Altun, ji KMM'ê (İHD) Nûnerê Herêma Deryaspî (Akdeniz) Metin Çelik, ji Mazlum-DER'ê O. Kemal Kocabiyik, rayedarên KMM'ya Edeneyê Abdurrahman Yakut û Maşallah Kasaphan û Serokê ÖDP'ya Edeneyê Hüseyin Akşen hebûn.

Koma Aştiyê bi encamên balkêş û sosret dawî li lêkolîna xwe anîn û dane zanîn ku, wê di rojên pêş de, encama lêkolînê xwe bi civîneke çapemeniyê diyar bikin.

Beriya ku Koma Aştiyê encamên qetlîama Küçükdikiliyê ji raya giştî re eşkere bike, me li ser navê Azadiya Welat bi Nûnerê Herêma Deryaspî yê KMM'ê Metin Çelik re hevpeyivînek çêkir.

Di 8'ê gelawêjê de li Küçükdikiliya Edeneyê, 5 kes ku 2 ji wan zarok bûn, ji hêla hêzên dewletê ve hatin înfazkirin. Der heqê vê bûyerê de dîtînen we bi çi awayî ne?

● Bûyera 8'ê gelawêjê, berî ku bûyer biqewime, ji hêla dewletê ve hatibû amadekirin. Beriya ku dest bi vê înfazê bikin, rê li ber xwe fireh kiribûn. Bi mantiqa “Mala ku hatiye tespît kirin xaniyê hucreyê ye û kî di malê de be divê werin îmhakirin” tevger kirin. Encam jî wê nîşan dide. Wekî ku me di raporên xwe yên di pêş de jî anîbû ziman, bi awayekî “bêxwîn” dikaribûn dawiyê li operasyonê bianîna, wê gavê zarokên bêgûneh û dê û bavên wan ên bêçek canên xwe nedidan.

Lê belê sed mixabin ku, politikaya dewletê ji vê yekê re ne musafid e. Ji ber ku dewlet bi salan e ku politikaya şidetê ji xwe re bingeş digere û siyaseteke xwîndar dimeşîne. Kesên ku di vê bûyerê de hatine qetilkirin, bi taybetî jî xwediyên malê, maxdûrên ve qetlîamê ne. Lêkolîn û çavdêriyên me, vê yekê bi awayekî zelal nîşan didin.

Piştî vê bûyerê, we digel hin saziyên demokratîk û pêşverû dest bi lêkolînekê di cih de kir. Der barê vê mijarê de tewra dewletê ya li dijî we çawa bû?

● Helbet dewlet di serî de jî û îro jî bi çavekî baş li me nanihêre. Bi taybetî beriya ku em dest bi lêkolînê bikin, me

bi Midûrê Emniyetê re hevdîtinek pêkanî û me got ku bûyerekî wiha ne ji rêzê ye, gelek aliyên wê yên tarî hene û ev jî şermeke dewletê ye. Lê belê Midûrê Emniyetê xwe sparte vê yekê: “Ji PKK'ê re alîkarî û kûryetî dikirin.” Bi vî awayî xwestin ku qetlîamê ji gel veşêrin û xwe mafdar, kesên kuştî jî bêmaf û terorîst nîşan bidin.

Me jî got ku bûyer ne wekî ku hûn dibêjin e. Heta me ev yek jî li rûyê wan da, emê bûyerê bixin rojeva raya giştî ya Tirkiyeyê û rojeva raya navnetewiyî.

Tu reaksiyoneke nebaş nîşan nedan. Li gorî wan çawa ku “mêş” hatibin kuştin ew qasî rehet bûn. Mixabin di vê nuqateyê de, tê xuyakirin ku kuştina mirovan, politikaya fermî ya dewletê ye. Li rûyê dinyayê mafê tu dewletê tune ye ku wiha anti-demokratîk tevger bike. Di vê navberê de, ji bo ku em encamên ve qetlîamê dikolin, dewlet bi şev û roj li pey me digere, sîxurên xwe dixin dût me. Dewlet nahêle ku em bi Yeter Kaplanê re hevdîtinan çêbikin. Nehiştin ku malbata wê jî here cem. Çend caran hatin ser me û em bi kuştinê tehdît kirin.

Ez muhesîb im (muhesibecî me), di van rojên dawîn de, dema ku ez bi muşteriyên xwe re hevdîtinan dikim, her dem ez di bin taqîp û çavdêriya polîsan de me. Ez van yekan mîna tehdîtê bi nav dikim û ji tişteki nebaş jî dewletê berpirs dibînim.

Di pêvajoya ku bangên aşti û agir-

bestê bi xurtî têne kirin de, çêbûna bûyerên bi vî awayî, gelo li gorî we tesadûf e?

● Ne xêr! Ne tesadûf e. Bi salan e ku dewlet ji bo şerê qirêj bingeşê ji xwe re ava dike. Ji ber vê yekê jî, îro sektoreke şer hatiye afirandin. Ew kes nanên xwe, ji xwîna gelên tirk û kurd derdixin. Ew kes tu car aştiyê naxwazin, her dem karê wan sabotekirina pêvajoya aştiyê ye. Tiştên ku îro têne jiyandin bi vî awayî ne.

Her çiqas dengêki aşti, biratî an jî agirbestê hatibe jî, di wan rojan de qetlîam ji hêla dewletê ve hatine kirin. Dema van qetlîman dikin jî, bûyerê dixin stûyê kurdan û partiya wan. Lê belê bûyerên Basayê (Güçlükonak) û bûyera kuştina mamosteyên demokrat li Meraşê, da xuyakirin ku ev qetlîam bi destê van kesên tarî ku di bin baskên dewletê de ne hatine kirin.

Li dijî van yekan em berpirs in ku di qadên legal de, gelê tirk û kurd neynin cem hev, biratiya gelan nekin armanc û politikayên şer deşîfre bikin.

Di hiqûqa navnetewiyê û literatûra mafên mirovan de cihê bûyerên bi vî awayî li ku ye û çî ye?

● A rastî ev e ku, wahşetên wiha li dijî hiqûqa navnetewiyê ne û di nav nîrxên insanetiyê de cih nagirin. Dewleta ku ji bilî darê zorê tu tiştî nafikire û nake, ew dewlet ne demokrat e û ji nîrxên mirovahiyê dûr ketiye. Îro li Tirkiyeyê û li

Kurdistanê avakirina aştiyê, ji afirandina şer zortir e. Li welatekî qelsbûna mirovan, bi xwe re qelsbûna dewletê jî tîne, ji ber ku karê dewletê parastina mirovan e. Ji ber vê yekê jî dema hûn wî gellî biperçiqîn, îmha û înfaz bikin, wê gavê hûn hebûna xwe jî îmha û înfaz dikin. Vê gavê dewleta Tirkîyeyê di vê pêvajoyê de dijî.

Cara dawî di 22'ê gelawêjê de "Koma Xebatê ya ji bo Aştiyê bi hev re" hat Edeneyê û Kûçûkdikilî jî ziyaret kir. Der heqê qetliamê de dîtîn, raman û çavdêriyên komê çawa bûn?

● Di 22'ê gelawêjê de, koma aştiyê ku em jî di nav de bûn, li cihê ku qetliam hatibû kirin, lêkolîn çêkirin. Em koma aştiyê der heqê vê qetliamê de di nav amadekirina raporeke berfireh de ne. Dîtinên komê bi kurta hî ev in:

"Qetliam rasterast ji aliyê polisên dewletê ve hatiye kirin. Kuştina amirekî polîsan, îmhakirina kesên di malê de nikare mafdar nişan bide. Lê belê di vî bûyerê de, dewletê ev yek kiriyê û zarok jî qetîl kirine. Dema vî yekê dike jî, hêstirên malbatên leşker û polisên ku têne kuştin, ji emelên xwe yê qirêj re dike hacet. Her roj di TV'yên xwe de van hêstir û azarên malbatên leşkeran didin weşandin, li hêla din, guh nadin êş û azarên malbatên bi dehan gerfîlayan ku nikarin herin ser cesedên zarokên xwe û wan veşêrin.

Ev tewreke yekalî û dijminatî ye. Daxuya-

niyên ku me ji Yeter Kaplanê girtin û çavdêriyên koma aştiyê hev û din temam dikin. Ji bilî dî û bavê Yeter Kaplanê û cara yekemîn ji komê, endamê TOHAV'ê Ebûqat Naciye Kaplanê, bi Yeter Kaplanê re hevdîtinek pêk ani. Wê gotiyê: "Di hundir de bombe neteqiyaye. Dewletê, zilamê wê û zarokên wê li ber çavên wê kuştine.

Piştî vî pêvajoyê hûnê çî bikin, gelo hûnê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û saziyên cihêreng bidin?

● Tirkîye dewletek e ku peymanên navneteweyî îmze kiriyê, ji ber vê jî, navê dewleta hiqûqa demokratîk li xwe kiriyê. Her çîqas dijwar be jî, hiqûqzanên vî welatî wê hiqûqa nav Tirkîyeyê bixebitînin. Ji bo ku qetliamên qirêj ronahî bikin. Wisa tî dîtîn ku dewletê "hiqûqa xwe ya ku tune ye" jî holê rakiriyê. Beriya lêkolînan Koma Aştiyê xwest ku bi Waliyê Edeneyê, Midûrê Emniyêtê û Dozgerê Komarê re hevdîtinan çêbikin.

Lê hevdîtin tenê bi Dozgerê Komarê re çêbûye, ew jî di rengê sohbetê de derbas bûye. Gotina dozger a "Çi were kirin ezê bikim" belkî di nav qaydeyên niyeta baş de, manîdar be. Rewşa fiilî ya îro, ji vî yekê re asteng e. Ji îro û bi şûn de emê çî bikin? Li Tirkîyeyê rewş diyar e. Emê jî oerê xwe bidin qada navneteweyî, saziyên demokratîk ên Ewropayê. Ta ku dewlet careke din dîsa şermezar bibe.



Mediya Kaplan



Fatma Kaplan



Ezize Altun

Der barê qetliama Kûçûkdikilîyê de me fikr û nêrînen eqrebeyên kuştîyan jî stand. Medya Kaplan (Diya Yeter Kaplan):

Heta dawiya dinyayê ez dawacî (dozdar) me. Heta em sax bin em vî qetliamê ji bir nakin. Em xwîna wan sexelan tu car ji wan re nahêlin. Wan mala me xera kir. Xwedeyo tu ji wan re nehêlî.

Fatma Kaya (Pirêka Rıdvan Altun): Tu sûcê zilamê min tune bû, bêpîrs û bêbersiv di 3'yê şevê de ew birin û kuştin. Ez heqê wî dixwazim. Ne tenê li vî dinyayê, li wê dinyaya din jî, her du destên min di qirêka dewletê de ye. Gerek e xwîna wan şehîdan û wan zarokan li erdê nemîne. Ez nagîrîm, bila dijmin pê kêfxweş nebe.

Ezîze Altun (Xwişka Rıdvan Altun): Emê li heqê birayê xwe bipîrsin. Nivê şevê bi ser mala wan de girtin û ew kuştin. Heta dilopek xwîna min hebe, ezê li doza wan xwedî derkevim. Ma kafîr jî wisa dikin?

Naciye Kavak (Xwişka Rıdvan): Tîştê wisa li ser rûyê dinê nehatiye dîtîn. Birakê min Rıdvan hê ev salek bû ku zewicîbû. Destê wî ji xebatê û karê çimaentoyê xera bûbûn. Divê dinya alem bi vî meseleyê bihese. Wan Dîlan û Bêrîvana 2-3 salî kirin terorîst. Ma qey emê hêviya çî jî vî dewleta hov bikin?

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

# Weşanên kurdî, kurd û bedewî

MAZHAR GÜNBAT



**D**ema ez çav bi weşaneke kurdî ya aliyê zimên ve bedew dikevim, bi dilgeşîyê mezîn wê dixwînim û dixwazim bidim xwendin. Di weşanê de ramanên tene pêşkêşkirin, li gorî min ne rast û mijar marîjal jî bin, rûmeteke mezîn didimê. Eger nivîsên weşaneke bi kurdî ji hêla hevokazîyê ve ji zimanê gel dûr neketîbin, ji aliyê rêziman û rastnivîsê ve, ji forma pîvanên ku Celadet Bedirxan tesbît kirine, zêde ne cihêwaz bin, û pariyek bêhna çanda gelêrî û pêjna daxwaza giyan û jiyaneke serbixwe û tozek jî taybetiyên hunera nivîskar ên zûdîtina detayên cihêreng tî de hebin, hingê ew nivîs bi dîtina min bedew in.

Di weşaneke bedew de ez hezkirina gel, rêz-girtina ji bo ked û nîrxên gel dibînim. Dibe ku ev, nêrîneke sêbjektîf be jî, dibe ku yek ji gel û çanda gel hez neke jî, ji ber hunera xwe ya edebî bikare bi dirûveki bedew bide nivîsên xwe. Lê wisa be jî, di encamê de, berhemên wiha, zimanê kurdî yê ku dîrok û felsefe, giyan û jiyân, evîn û nevîna neteweyekê di xwe de kom kirine û di nav rêwîtiya demê ya pênc hezar salan de ew gihandine heta îro, ji windabûnê xelas dikin û gemaheya çand û kelepura kurdî bi kesan didin hezkirin. Ev jî, niyet çî dibe bila be, xizmetekî mezîn e ji bo gel.

Yekî/e ku pariyekî ji çanda civaka kurd û dîroka wê haydar be, wê bizane parastin û pêşvebirina zimanê kurdî tî çî maneyê. Kurdan hemû dîroka xwe, çand, huner, felsefe, wêje,

xweşi, nexweşi û her cure nîrxên xwe, li zimanê xwe siwar kirine, bi dîh û dafan, di nav hezar cure kend û kospan, di nav êş û azarên dijwar û xedar de, ajotîne û anîne roja îro. Ji ber vê yekê, di her peyveke kurdî de parçeyek jî çanda gel heye, di her gotineke pêşîyan de awirê felsefeyê kurdan heye, di her axî û qirîneke kurdî de, di kûrahiya dil de îfadekirina tevkuji, êş û azarên jiyana gelê kurd heye û di her biwêj, pêkenîn û çîrokeke kurdî de jî her wiha nexş û nîgarên kurd û Kurdistanê hene.

Eger ev ziman baş bê bikaranîn û bi girîngî li ser bê rawestî, hingê ev nîrxê giş bi saya nivîsînê wê ji windabûnê xelas bibin, her wiha bedewiya çand û hunera gel jî wê li ber çavan bê raxistin. Bi rastî jî dema mirov li dîroka Kurdistanê mîze dike, dibîne ku pêvajoya deh panzdeh salên dawî ne tî de, hemû nîrx û hêjahiyên welatê me, tenê bi navgîna zimanekî bihêz û bedew û bi hin adet û kevneşopiyên jiyana gelê kurd gihane serdema me..

Du - sê kovar û rojname ne tî de, bi giştî weşanên kurdî, çî ji ber şertên dijwar, çî ji ber egerên din, lê bi piranî jî ji ber girîngînedan û nêzîkîtedana bêxer, bi zimanekî şikestî, bi mijarên zêde kevnare, bi dirûv û mîzanpajên kêfrevîn û di ser re jî bêrêkûpêk derdikevin. Bi awayekî din eger mirov bibêje, ji bo ku derkevin, derdikevin. Eger ne bi wê niyetê jî derketîbin, di encamê de întibaheke bi wî rengî li ser mirov dihêlin.

Hin kovar û rojnameyên nîvî kurdî nîvî jî bi zimanên din hene. Tîştên ku bi zimanên din diweşînin, bi rastî zêde ne xerab in. Lê belê rûpelên wan ên kurdî ji her aliyê ve wisa bêsewîyê û bêqelîte ne ku, mirov bivê nevê ji xwe dipirse ku ev kes çima pêdiviyê dibînin ku bi kurdî jî weşanê bikin; min hê fêm nekiriyê ev kes çima vî tevkujiyê li ser ziman û weşanvaniya kurdî pêk tînin.

Kes nikare bibêje ku zimane kurdî tîr nivîsandinê nake û ev kemasiyên ku hene jî, ji ber qelsiya kurdî ne. Kes nikare îdia bike ku gelê kurd girîngiyê nade estetîkê, ji ber vê yekê jî weşandina berhemên nebedew û icûbe layîqî gelê kurd tî dîtîn. Yekî ku pariyek jî haya wî ji ziman û jiyana gel hebe, wê bi hêsanî bibîne ku gel wekî çavê xwe di her warî de xeml û bedewiya jiyaneke parastîyê; ji killkirina çavan bigirin, ta honandina keziyan, ji rengeyê kiras û cur bi cur libasên gelêrî bigirin, ta nexşandina navbalaşkan, ji bêhejmar stran û çîrokên xweş û gem bigirin ta qewl û metelokên lihevhatî, ji gelek heman û awayên din ên jiyana li Kurdistanê, xuya dibe ku tevî hemû şert û mercên dijwar tu car gel dev ji bedewî û xemla jiyaneke bermedaye.

Em van xisûsiyetên kurdan di jiyana û bi piranî jî di zimanê wan de xweş dibînin, bi taybetî jî di zimanê devkî de, ji ber ku ji ber sebebên cur bi cur, nebûne xwedî derfet da ku bi berhemên nivîskî û bi navgînen din vî yekê bikin.

Niha tiştê ji me tî xwestin û barê ku dikeve ser milê me, ew e ku em van hêjahî û bedewiyên ku bi navgîna zimanê devkî xwe ji êrîşên dirende filitandîne û hatîne heta îro, lê belê bêtaqet ketine, ji bo ku careke din birînen xedar nestînin, pêşî di warê nivîsînê de, dû re jî di hemû warên din ên hunerî û akademîk de rakin ser piyan û bi hêza teknîk û derfetên pêşkêşî yên berbangsê sedsala bîstuyekana bixemlînin.

Weşanên ku bi kurdî derdikevin, dikarin rola sereke biltzin di pêkanîna karekî ew çend pêwîst û girîng de. Van rojên dawî dema min pirtûka Helîm Yûsiv (Mîrî Ranazin), kovara Dugîr ku li Swêdê derdikeve, û hebbestên Şêro Bêkes û Letîf Helmet bi dilgeşîyê mezîn xwendin, min xwest ez wan bi kesên din jî bidim xwendin.

# 'Nan û av' bi kurdî çî ne?

Sazî û zimanzanên ereb, tirk û ermaniyan dest avetibûn karekî wisa, lê millet li dû wan neçû.

Mînak, ermenî ji makarûnê re dibêjin:

"Hevîrê zirav û dirêj ê li hev badayî.

Ev tev bû makarûn.

Jixwe "dûrdîtînok" û "dûrbihîstok" jî, ermenî bi kar tînin, lê gelê wan di axaftinên xwe de bi kar naynin.

**M**e sernava xwe "Nan û av" bi kurdî çî ne?" danî. Ji sernavê diyar dibe ku mijara me ziman e. Van salên dawî weşanên kurdî li ser ziman gelek gotûbêj li dar xistin, kesên ji ziman fêr dikin û kesên jê fêr nakin tevî van gotûbêjan dibin.

Hinek kurdên balepaş hene ku, hema maye ku 'nan û av' bi kurdî çî ne bipirsin. Gelek tiştî dipirsin, bersiva xwe werdigirin, lê dîsa ji ya xwe nayên xwarê û şaşiyên xwe radikaltir berdeham dikin. Heger bêhna xwendin û nivîsandinê ji wî kesî were, dibe îdiomîst, dialektîst, herêmperêz û hwd. Ev jî, bi rastî serê zimanzan, weşankar û rojnamegeran diêşîne. Mînak, gelek kes hene ku xwe nivîskar û rewşenbîr dihesibînin, lê hîn jî bi devoka gundê xwe dinivîsin. Gotinên wisa jî, di deh deqeyan de serê redaktor gêj, çavên wî kor dikin.

## Ziman ji hev peyvan deyn dikin

Helbet ev kesên hanê, peywirdar in ku gelê xwe zane bikin, lê ne wan kesên ku ji ziman fêr nakin û ji ya xwe nayên xwarê. Ji zimanzan bigire ta rojnamevanan bi sedan car bersiva pirsên pûç dane, lê ew kes hîn jî dipirsin "telefon bi kurdî çî ye? Televîzyon bi kurdî çî ye? Komûnîzm, împeryalîzm, demokrasî û hwd. Dema ji wan re tê ravekirin jî, îtiraz dikin û çênekirina beramberê van peyvan wekî kêmasiya zimanzanan dibînin.

Peyvçêkirin ne av û ax e ku mirov tevlihev bixe, bike kelpîç û çêbike. Nexasim salên dawî li nav hin kurdan peyvçêkirin, bûye mode, her kes bi serê xwe peyvan çêdike. Heger wisa berdeham bike, di demeke nêzîk de wê ferhenga me bigihîje 2-3 milyon peyvan. Ew jî dê bibe bela serê me, ji bo ku îcar nikarin xwe ji wan peyvên çewt û pûç bifilitînin.

Ew peyvên ku me li jor dan, tev yewnanî ne û dinya tev wisa bi kar tîne. Zimanên ewrûpî ku bi dewlemendî û bi axaftina xwe li dinyayê yekemîn in jî, van peyvan bi kar tînin. Zimanzanên wan jî hene, sazî, dibistan û alfabayên wan jî hene, gel û dewletên wan pêşkeftî ne; ji aliyê zanistî ve xurt in, eger ew bi pêşkeftin, xurtbûn û zanebûna xwe, peyvgirtina ji zimanekî ji yê xwe biçûktir, normal bibîne, navê televîzyonê daneyne "dûrdîtînok" û navê telefonê daneyne "dûrbihîstok", ku em jî bi kar bînin, em gunehkar nabin.

Sazî û zimanzanên ereb, tirk û ermaniyan dest avetibûn karekî wisa, lê millet li dû wan neçû. Mînak, ermenî ji makarûnê re dibêjin: "Hevîrê zirav û dirêj ê li hev badayî. Ev tev bû makarûn. Ji xwe "dûrdîtînok" û "dûrbihîstok" jî, ermenî bi kar tînin, lê gelê wan di axaftinên xwe de bi kar naynin.

Hebûna peyvên biyan, di dîroka mirovahiyê de, ji dialektîzmê tê. Heger em bibêjin bila tu peyv û bêjeyên zimanên biyan di nava yê me de tune bin, hingê divê ku li malê em xwe hepis bikin, dengê biya-

nannebihîzin.

Welatên sosyalîst 70 salî xwe hepis kirin, lê dema sînor vebûn, ji tîkiliyên bazirganî tenê be jî, bi hezaran peyvên kapitalîzmî tevî yê wan bûn. Bazirganî ji destpêka dîroka mirovahiyê heta niha, der barê deynkirina peyvên biyan û xurtkirina zimanan de, xwedan rist e. Madem em dê nikaribin bazirganiya gerdûnê rawestînin, divê em li zane û zanyarên wî warî guhdar bikin, ji wan re bibin alîkar, ne problemkar.

Jixwe ev gelş û kesên ku ji alfabe ya kurdî ya yekgirtî û zimanê yekgirtî re dibin asteng, nahêlin ku pêşkeftin çêbin. Ew kesên hanê, xwediyê hebûneke wisan in ku, ne zimanê xwe û ne jî yê xelkê dizanin. Heger zimanek bizanibûna, dê dev ji wan îdiayên pûç berdana.

Zimanê me ne zimanekî biçûk û nexweş e. Zimanê kurdî, ji tirkî û farisî ne kêmtir e, erebî ji kurdî ne xweştir e. Li gorî saziya zimanzaniyê ya tirkî û tir-

kologên wan, heşt hezar neyvên di ferhenga wan de xwerû bi tirkî ne, yê din jî, ji zimanên din wergirtine û bi kar tînin. Lê kurdî deh caran li heşt hezarî dike, ango heştê hezar peyv di ferhenga kurdî de hene. Ka ya tirkî ji sî û pênc hezarî dibuhure? Yanê kurdî bi rewşa xwe du car li tirkî ye.

Îro li pêşberî me sê problem hene:

1. Pêkanîna alfabe ya yekgirtî
2. Bilêvkirina yekgirtî
3. Li welêt avakirina dibistana mamosteyan.

## Zimanê kurdî ne zimanekî biçûk e

Dem a ew gelş çareser bûn, hingê dê mezinbûn û dewlemendbûna zimanê kurdî were xuyan. Di warê dewlemendbûnê de zimanê kurdî di asta gelek zimanên ewrûpî de ye, ji gelekên jî pêşketîr û melodîktir e. Îcar dost û dijminên wisa jî bila bela xwe ji zimanzan û weşankaran vekin, ku ew hêsantir bixebitin û xurtir berhevan bidin.

Mebesta vê gotara min danasîna ziman û agahdar kirina wan kesan e ku, dagirkeran çawa malên xelkê talan kirine, wisa zimanê wan talan kirine. Mînak tirkî berî komarê, osmanî û ew jî, ji kurdî, farisî, erebî, tirkî, arnavûdî, azerî û hwd. pêk dihat. Tirkî zimanekî bêbingeh e, ji bo ku bêbingeh e; 70 sal e ji zimanê din arî nebûye.

Tim min dibihîst ku tirkologan digotin peyvên tirkî bi tîpa "m"yê dest pê nakin û çend tîpên din jî mînak didan. Peyvên ku bi van tîpan dest pê dikin, yek ji wan jî ne yê me ne."

## Gelek peyvên romenî di tirkî de hene

Ferhenga romenî kete destê min, ev gotin hate bîra min û min li tîpa 'm'yê mîzand, min dît ku gelek peyv hene.

Ji ber vê çendî min ferheng lêkoland, peyvên ku em wekî erebî, farisî, tirkî, dizanin, romenî derketin. Ez bawer im ev dê bibe bersivê ji wan kesên ku erebî, tirkî, farisî nizanin û hinek peyv ne kurdî ne, ji wan zimanan in. Îdia bi zanebûn îspat dibin, ne bi devgalî!


Belkî hinek bibêjin osmanî li balkanan gelek mane, ew peyv jî, ji dema osmaniyan mane, dibe, lê ne ev çend!. Dewlet û gel di bin dagirkeriyê de nemînin jî, ji hev peyvan deyn her digirin, lê bêhtir yê cînarên hev, ên nêzîk. Piştî ku ji bin dagirkeriyê derdikevin jî, zimanê xwe paqij dikin. Gelek ji wan peyvan ku em dê mînak bidin, bêhtir kurdî û hînd-ewrûpî ne.

Bi baweriya min ji ber ku hînd-ewrûpî neavêtine, ji xwe wekî yê xwe hesibandine. Gelek peyvên ferhenga romenî, ne romenî ne jî, latînî ne, îtalî ne. Ji van peyvan gelek di kurdî de hene, lê dengên wan li cem me stûr bûne. Mînak gaitan, bûye qeytan, cantan bûye qazan, cusur bûye qusûr û hwd. Peyvên wisa pir in.

Li gorî hinek îdiayên zimanzan tîpa 'q'yê di kurdî de tune bûye, di bin tesîra zimanên xerîb de maye. Ez jî bi wan zimanzan re me, divê lêkolîneke baş li ser dengên kurdî were kirin û tîpên rast werin hilbijartin.

Roman û romanî bi xwe ji gelê Romaniyê. Zimanê Roma, ji zimanên gelê gerdûn ên kevntirîn e, pêwistiya wî bi zimanekî wekî tirkî nîn e. Heger li Romaniyê jî wekî Bulgaristanê tirkên binçih bi milyonon hebûna, ji bo ku du gel di nava hev de dijîn, dê peyvên tirkî hebûna.

S.S DILPOLO





- 1'ê rezbera sala 1939'an, Şerê Cihanê yê Duyemîn dest pê kir. Piştî ku şer qediya, di sala 1945'an de roja yekê rezberê li dinyayê bû 'Roja Aştiyê.' Di Şerê Cihanê yê Duyemîn de bi milyon mirov hatin kuştin û seqet man. Bi milyon ji bêmâl û bêwar man. Ji bo ku careke din şerêkî bi vî rengî xwînrîj çêbebe li rûyê dinyayê rêxistinên mafê mirovan û rêxistinên li hemberî şer hatin avakirin. Her sal roja yekê rezberê li tevî dinyayê bi çalakîyên aştiyê û biratiyê tê pîrozkirin. Lê he jî li rûyê dinyayê nêzikî çil cihî şer dimeşe.
- 5.9.1993: Mebûsên DEP'ê Mehmet Sincar û Metin Özdemir li Batmanê jî aliye kontrayan ve hatin şehîdkirin. Di vê bûyerê de

Nizamettin Toğuş jî birîndar bû.

● 7.9.1982: Li Grîgeha Amedê ya Leşkerî di berxwedana birçibûnê de Kemal Pîr şehîd-ke.

● 6-16.9.1938: Piştî ku Serhildana Seyîd Rîza li Dêrsimê têk çû, îcar dewleta tirk herekateke din pêk anî. Mebest ew bû ku germegerm gel çavîrsî bikin, ji bo ku careke din serhildan çêbebe.

● 7-14.9.1930: Dewleta tirk nikaribû pêşî li Serhildana Çiyayê Agirî bigire bi Qetîlîyê Zîlan û Êrişên cur bi cur li ser kurdan pêk anî, wê bi, alikariya Îranê êriş bir ser hêzên kurdan ên ku li Çiyayê Agirî şer dikirin. Bi vê êrişê jî Serhildana Agiriyê têk çû.

AWIR

# Dilê kurdan ji salnameyan sar e



**Tu kîjan rûpelê ji salnameya dîrokê biqulibînî ji laşê kurdan xwîn diçe. Birîneke wan a kevnare ji nû ve der dibe. Li vir salnameya dîrokê yekcar bi xwîna serok û rêberên kurdan hatiye "xemilandin" û ji ber vê yekê jî, kurd û dîrok, kurd û salname li hev nakin, ji hev ne xweş in... Xwîniyê hev in.**

**T**u kîjan rûpelê ji salnameya dîrokê biqulibînî, ji laşê kurdan xwîn diçe, birîneke wan a kevnare ji nû ve der dibe... Li vî welatî dîrok ji aliyê biyanan ve bi xwîna kurdan hatiye nivîsandin. Li vir salnameya dîrokê yekcar bi xwîna serok û rêberên kurdan hatiye "xemilandin" û ji ber vê yekê jî, kurd û dîrok, kurd û salname li hev nakin, ji hev ne xweş in... Xwîniyê hev in.

Piştî ku li başûrê Kurdistanê hikûmeta federalî ava bû, di nav salekê de kolanên Hewlêr, Silêmaniye, Duhok û gelek bajarên din tevde bi wêneyên kuştîyan hatin xemilandin. Lê li vî aliyê he ev jî ne mimkûn e, Hê kurd nikarin peykerekî (hêykel) Musa Anter çêbikin û bibin li kolaneke bajarê Amedê biçikîni... Dîsa li rojhilatê Kurdistanê jî, hêja kurd nikarin li Meydana Çarçirayê peykerekî Qazî deynin.

Li vir dikujin û nahêlin xelk li termên kuştîyên xwe xwedî derkevin, wan bibin li goristanê veşêrin. Dixwazin ku termê her kuştîyekî kurdan li erdê bêxwedî bimîne. Û ew xêra xwe wan veşêrin!..

Di 5'ê rezbera sala 1993'yan de li bajarê Êlihê (Batman) êrişî mebûsên kurdan kirin. Di wê êrişê de Mebûsê Mêrdînê Mehmet Sincar hatibû kuştin, Mebûsê Êlihê Nizamettin Toğuş hatibû birîndarkirin û dîsa Rêvebirê Partiya DEP'ê Metin Özdemir jî hatibû kuştin.

Tenê bi kuştinê neman û jixwe derdê wan î mezin ne kuştin bi xwe ye: Daxwaza wan a herî mezin ew e ku termê serok û rêberên kurdan li erdê bêxwedî

bimînin. Û ew kesên ku wan ji xwe re kirine rêber, bi saxî bikujin! Ne laşê wan, lê bêhtir hêviya wan bikujin, di laşê wan de rih ziwa bikin!.. Mirazê wan ev e... Sebebê çavsooriya wan, kîn û xezêba wan a bêdawî ev e.

Û mixabin ku gelek caran gihîştine miraza xwe, daxwazên xwe yê gemar û li derveyî insanetiyê birine serî...

Lê ev car, wekî caran ji wan re li hev nehat...

Nehîştin ku partiya DEP'ê û kurdên ku bi rayên xwe Mehmet Sincar ji xwe re kiribûn rêber, wî veşêrin. Êriş birin ser dilşewatên Mehmet Sincar. Heta mebûs jî, ji lédana polîsan bêpar neman. Piştî lédan û girtinan, kuştîyê wan jî talan kirin, revandin, birin...

Xwestin ku wekî her car, careke din rêberêkî kurdan bêxwedî bihêlin. Xwestin ku vî karî di nav çarçoveya qanûnên xwe de çêbikin, lê çênebû. Dema gazî bavê Mehmed Sincar kirin ku bi wan re here kurê xwe veşêre, bavê wî qebûl nekir, got:

"Ev cesed ne yê me ye, yê wan kesan e ku ew ji xwe re mebûs hilbijartin, rêber ecibandine... Ku ew bi cenazê xwe re nemeşin, ez jî li dû vî cesedî gaweke navêjim!.."

Û temamê kurdan di televîzyonan de ditin ku rêberêkî wan wekî sêwiyekî bêkes û bêxwedî birin binax kirin...

Û birîna wan kûr bû...  
Û kîna wan zêde bû...  
Û yê ku ew kuştin, poşman bûn...  
Di vê bazarê de xisîrîn...

RAHMÎ BATUR

## ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÛGÎT



### Apê Mûsa dûvajoyê Sokrat û Kemal Fuad û...

**S**alvegera şehadeta Apê Mûsa nêzik dibe. West e, careke di em bîreweriya Apê Mûsa bi nû vekin. Ewî çend gotinên ku Apê Mûsa digotin û hêz ji wan dikir: "Sawcî ne seriyek, belê sed seriyên min hebin û tu her car yekî jê bikî ez dev ji doza xwe bernadim." "Heyv û roj bibin du ferên aşan û hûn serê min di nav wan de bihêrin, ez careke din ji ya xwe nayem xwarê." "Fikrên siyasî mîna liva kulêv in tu çendî lê didî ew çendî pitewtir û bihixtir dibin."

Di van gotinan de helwestek heye, qerardarî û bawerîxurtî heye. Şexsiyet û Karakter heye. Çend bûyer: Serhildêrê navdar Babek piştî şerêkî qehremanî li dijî xelîfeyên Bexdayê dîl dikeve. Xelîfe Mutasim dê wî îdam bike, belê ev îdam bi eziyet û azar e. Ewî destê rastê jê dikir. Buqbuqa xwîne ye. Babek bi destê çepê xwîna destê rastê di ruwê xwe dide. Da ku temaşevanên meraqdar nebêjin Babek tirsîya û ruwê wî zer bû.

Agîs li ser riya îdamê jî hevaleyî xwe re dibêje: "Megrîrî deshelatdariyek narewa min îdam dike, ez ji qatilên xwe baştir im."

Û Sokrat, piştî ku heta dawiyê li biryara îdamkirina xwe guhdarî dike, bi dengêkî bi xwe ewle berê xwe dide dadgeran û dibêje: "Heger bi dû mirinê de jiyanêke din hebe ez dê careke di pêşêra we bemedim û li wir jî ezê dadgerên mîna we bidim ber pîrsan. Ji ber ku li wir êdî mirin jî tune ye, ez dê vî karî bi kêfa dilê xwe bikim."

Rewşenbîr û şexsiyetên ku li ser riya baweriyên xwe hatine kuştin, bûne goriyên rastî-parêziya xwe, tim pêde bûne. Ev şexsiyet jî berî zayînê û piştî zayînê ne, ji demên kevn û nû ne, ji vî mezheb û dînî, ji wê neteweyî û neteweyên din in.

Apê Mûsa û jiyana wî bivê nevê kesên ku di nav sînorên welat û neteweyên xwe de hilnayên û bûne malê dinyayê, tîne bîra mirov. Bi taybetî heger mirov hinekî bi dîroka kesayetî û mîrxasiyê serê xwe eşandibe, hinekî haya mirov ji dîroka berxwedana şervanên fikra azad hebe û nîrxekî bidê, careke di mirovên mîna Mûsa tîne bîra mirov. Mirov nikare van şexsiyetan bi bir neyîne û rol û giraniya wan di derketina hogên mîna Mûsa de jî li ber çav negire. Ev ji cihekî û pêde pîrseke murwetê ye. Çawa gava ku mirov ji berhemên nivîskarekî hin tiştan digire, divê navê xwediyê berhemê bidêkirine, û nedêkirandin ji awira namûsa fikrî ve qusûrek e, her wiha di pîrsa şexsiyetên nimûneyî û xisletên şexsiyetavakirî jî de, divê duristî hebe, divê bendewarî hebe û şexsiyetên ji fêrisên piştî xwe re bûne seyda û rêber divê bêne navandin û dêkirandin.

Baweriya xurt û cesaretî jî mîna fikir û pêzanîne, rastgoyî û helwestgiriye û her wiha mîna ehlaq û rewîstê, ji cihekî bi xwedî dibin. Piştî xwe didin derekê. Xwedî damar û malbat in, silsile û zincîreke wan jî heye.

Kî dikare bibêje ku tesîra Sokrat û Seîdê Kurdî di mehkemeyan de, Pîr Sultan Ebdal û Giordano Bruno li ber kuştîne, Dr. Kemal Fuad û Bavê Tûjo li ber sêdarê, berxwedana zindaniyên mîna M. Emîn Batû, Mezlûm, Kemal û Xeyrî û şexsiyetên mîna Wedat û Huseyîn Deniz li ser Mûsa tune bû û Mûsa ji wan xalî bû?

Ne giş pêzanîn û baweriyên mirov, ên mirov in û ne jî karakterê mirov bi tenê ye mirov e. Muheqeq pişka kultura mirov di nav de çavên xwe vedike, rola cihanî fikrî û dîroka welat û neteweyên din heye. Mirovek çendî mîrovê serdema xwe be, çendî law û keça roja xwe be, çendî bi zeman re be, ev tişt bi wê derecê rastir e, bi wê derecê munaqesexwaztir e.

Haya Mûsa ji sedî sed ji berxwedana Îsa, ji Hz. Alî, ji Babek, bi ihtîmaleke mezin ji Şah Agîs, ji Şêx Bedredîn, Helacê Mensûr, ji Nesîmî û ji kesên din ku ji bî baweriyên xwe hatine kuştin, hebû. Yana dê çawa ew qasî çavnetirs, meydanxwên û qaçexwaz bûya? Gava ku mirov bala xwe dide gotin û nivîsandinên Mûsa, mirov dikare pêjna van şexsan bike. Carinan vekirî û bi nav û carinan jî di nav rêzan de di psikoloji û ruhê gotin û nivîsandinên wî de.

Ji van mirovan gişan di Mûsa de û li ba Mûsa tiştêk heye: Naxwe Mûsa hinekî Sokrat û Îsa, çend derhevan Giordano Bruno, çend weqîyan Kemal Fuad, bi aliyekî xwe Babek û Nesîmî û bi hin şaneyên xwe jî, Pîr Sultan Ebdal û Şêx Bedredîn e.

# 'Min bawer nedikir ez van rojan bibînim'

Zimanzanê kurd

Feqî Huseyn, nêzikî şêst salî ye ku bi zimanê kurdî re eleqedar dibe.

Digel vê yekê, heye pêncî sal jî ku bi siyasetê mijûl e.

Hevalê me ZANA FARQÎNÎ pê re peyivî û bi pirsên xwe ew bire raboriya wî û careke din ew anî roja îro. Bi vê hevpeyvinê me xwest em jî kirtek biavêjin rûpeleke dîroka xwe.



**S**erê pêşin der barê zimên de em dixwazin dest bi pirsên xwe bikin. Çimkî hûn berî her tiştî wekî zimanzan tene naskirin. We çawa dest bi xebata li ser zimên kir?

□ Di emrê sêzdehan de ez çûm medreseyê, tê de dersên erebî dizivirandin kurdî û wisa em hîn dikirin. Îcar kitêbên kurdî jî hindik hebûn, di medreseyan de. Serf û newhat erebî yanê kitêbên gramera zimane erebî hebûn û îzeheta wan bi kurdî bûn. Ew jî yek - dîdo bûn. Ên din hemû bi erebî bûn û pişt re werdigerandin kurdî.

Min jî feqehên hevalên xwe re digot. Min newêribû jî seydayê xwe re bibêjim. Min digotê feqeyên hevalên xwe: "Çima bi kurdî tune ne? Wan jî digot: "Qaydeyên zimane kurdî tune ne."

Vêca ez kîjan qaydeyê zimane erebî hîn bibûma, min ew qayde dida ber a kurdî. Min didit ku kurdîya wê jî heye. Ji wê wextê ve ji min re bû meroq. Di emrê çar-dehan de, min jî feqeyên hevalên xwe ve-sarî dest avête zimane kurdî.

We behsa medreseyê û zimane wê kir. Tê gotin ku zimane medreseyê erebî bû û zimane kurdî jî wekî zimane alîkar dihat bikaranîn. Li ser vê yekê hûn dikarin ji me re çi bibêjin?

□ Kitêbên dersan, hemû bi erebî bûn. Du-sê heb ne-tê de. Ew bi kurdî dihatin tercûmekirin. Di medreseyan de bi kurdî ders dihatin dayin. Yanê feqe û mele ew kitêb bi hev re dixwendin, vêca mele kurmanciya wan jî feqehan re digot.

Ji aliyê din ve kitêbên dersê yên bi farisî jî hebûn. Dîsa mele, seyda ew bi farisî dixwendin û ji bo feqehan li kurmancî werdigerandin. Di medreseyan de bi tirkî

tu tişt nedihate dayin.

Gava we edî tam dest avête gramera kurdî, li ber destên we xebatên li ser zimane kurdî hebûn, an jî we hay ji xebatên Celadet Bedirxan wan hebû? We alfabeva Celadet dinasî?

□ Der heqê xebatên li ser zimane de ez vê bibêjim. Min notên xwe digirtin. Gava min dit ku Kemal Badilî li ser zimane dixebite û min li xebatên wî nihêrî, min dit ku ew jî min min di warê zimane de bi pêş ve çûye.

Wê wextê min sûret ji ber notên xwe derxistin û min teslimî wî kirin. Min got: "Edî ez dev ji xebatê berdidim." Kêfa min jî tarîxê re dihat. Edî ez ji li ser wê xebi-

**E**m gelekî bi pêş ve çûne. Lê baweriya me ew qas tune bû, wê wextê. Min digot emrê min sed sal be jî kurd nagihîjin vê sewiyeyê. Îro, roja rêxistinbûniyê ye. Bihevrebûn şert e. Vêca ew, di partiyan de, di yekîtiyên wekî doktoran, mamosteyan, nivîskarên, ebûqatan, muhendîsan û hwd. de dibe ew dizane.

tim.

Min di sala 1962'yan de notên xwe teslimî Kemal Badilî kirin. Di 65'an an jî di 66'an de pirtûka wî hate çapkirin. Wexta min ew tetqîq kir, bawerî jî min re çêbû ku dîsa xebateke din ji min re lazim e.

Di xebata li ser tarîxê de jî ez bi ser neketim. Lewre min dev ji xebata li ser tarîxê berda û ez careke din vegerim xebata li ser zimane.

Di sala 1977'an de min xebata xwe ya li ser gramere qedand û min jî rexneyê re vekir.

Piştî wê, gramera Kamûran Bedirxan

kete destê min. Min jî qaydeyên rêzimana wî feyde nedît. Min jî ya Badilî feyde dît. Tenê min terimên zimane en Kamûran bi kar anîn. Lê min tenê "cînavk" jî ya wî hil-neda. Wî jî cînavkê re "pronon" digot. Ew jî min re ecêb dixuya. Min jî li ba xwe di gûna wê de "cînavk" danî.

Agahiya we li ser alfabeve hebû, alfabeva Celadet Bedirxan?

□ Hawar bi destê min neketibû. Sal 1962 an 1963 bû. Di wan salên hanê de alfabeva Osman Sebrî bi destê min ket, ku jî alfabeva Celadet Bedirxan bû. Min jî wê alfabeve feyde dît.

Beriya vê yekê we herfên erebî bi kar

dianîn?

□ Belê min bi herfên erebî dinivîsand.

Em dizanin ku hûn jî mêj ve di nav siyasetê de mane, hem jî bi awayekî çalak. Têkiliya we bi siyasetê re çawa û çî çax çêbû?

□ Sal 1946, zivistan bû, di 12'ê meha reşemiyê (sibatê) de, ez çûm leşkeriyê. Di wê salê, di havînê de hilbijartin çêbûn. Li cihê ku min lê leşkerî dikir, ez jî leşker bêtir wekî kesekî sivil bûm. Em di "îş ocaxî"ya leşkeriyê de dixebitîn. Ji ber vê yekê, ji me re ders û talimên leşkeriyê tu-

ne bûn.

Em ketin nav xelkê siyasî û me got par-tî yanê çi? Tabî me partî nas kir. Taze Partiya Demokrat (Demokrat Partî), hatiye danîn, du partî çêbûne falan filan... Di wê mudeta leşkeriyê de ez hînî siyasetê bûm.

Min di sala 1949'an de teskere girt, di sala 1950'an de jî de hilbijartin çêbibûya. Vêca partî li Bilisê hatin danîn. Li Tetwanê jî min û hinde hevalan Partiya Demokrat danî.

Lê, vêca digotin ev siyaseteke hikûmetê ye. Dewlet xelkê tespît dike ka kîjan di elehiya dewletê de ye. Piştî hilbijartinê de serê hemûyan bibire. Lê min partizantî ditibû û min ew dizanibû, lewre yan gotinan teşîr li min nedikir.

Wan kesên ku wekî min siyaset dizanî bûn, hejmara wan hindik bû. Ji wê rojê ve em ketin nav siyasetê. Di beriya vê yekê de, wexta ku ez neçûbûm leşkeriyê min meseleya siyasetê kurd dizaniya. Tabî piştî gelek zemanan ez pê hesiyam.

Seydayê min ê mezin dersa min dida. Îcar gava ku dersa min dida, hinek tişt jî ji min re digotin. Hikayetên xwe yên siyasî jî min re digotin.

Seydayê min di Hereketa Şêx Seid de qazî bû. Îcar hemû serpêhatiyên xwe jî min re digotin. Lê min nedizanibû ka ji bo çî ji min re wan tiştan dibêje. Emrê min 13, emrê min 14, emrê min 15, di wê wextê hanê de jî emrê seyda 60, 65 bû.

Pişt re ez pê hesiyam ku seydayê min ez digihandim ji bo siyasetê.

Ji bo xatirê meseleya kurdî ez ketim siyasetê. Me digot qey Partiya Demokrat dê tişteki ji me re bîne. Ez du salan mam-tê de. Min dit ku tişteke çênabe.

Di 1961'ê de wexta Yeni Türkiye Partisi (Partiya Tirkiyeya Nû) hate danîn, he-



mû xortên me ketine navê. Min got parti ev e. Di wê de jî ez şeş mehan xebitîm.

*Partiya Dr. Yusuf Azizoglu wan...?*

□ Belê ya wan. Min dît ku ne ev parti ye jî. Êdî min dev ji siyaseta wan partiyên berda. Ez mam li hêviya siyaseta Kurdistanê. Di sala 1965'an de ez ketim nav Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Tirkîyeyê.

*Hûn li ser erf û adetên kurdan, çanda kurdan jî dinivîsînin. Di vî warî de jî we wê demê lêkolîn falan kiribûn?*

□ Li ser gotinên mezinan, li ser wezîzan ez gelekî sekinim. Li ser stranan, li ser dîlokana, li ser kurteçirok û li ser çirokan, li ser romanê, li ser wezna kurdî ez pir xebitîm. Yanê notên min ên tîra 10-15 pirtûkan hebûn. Ew qas jî xebatên min ên li ser edebiyata kurdî ya kevn, ku min ew berhev kiribûn, hebûn. Ew hatin îmhakirin.

*Ew xebatên we tev hatin îmhakirin, çawa?*

□ Belê ew tev hatin îmhakirin. Ên ku nûshayên wan hebûn fîlîtin. Wê wextê gramera min hatibû nivîsandin û neh-deh nûshayên wê hatibûn belavkirin, ji bo rexneyê. Ew fîlîtin, lê yên din tev îmha bûn.

Di sala 1979'an de li Tetwanê, wexta ku gotinek derdikeve dê xelkê bigirin, xwenga min radibe xebatên min dike sendoqê û dibe di bexçe de binerd dike. Xebatên min li mala wê bûn.

Qey hûn kes dibînin, radibin sendoqê ji bin axê derdixin, dibin. Ka ji wan kirê zêr in, silê in, çî ne. Me piştî re sendoq di behrê de dît. Lê xebatên min nehatin dîtin.

*Hûn piştî re li ser wan careke din xebitîn?*

□ Naxêr. Êdî careke din min nekarî ku ez li ser wan bixebitîm.

*Li ser pîrhêlibûna we jî ez dixwazim rawestim. Digel xerati û siyaseta we çawa dikaribû xebatên çandî jî bikira? Bi destê hîlgirtina çend zebeyan ne zor e?*

□ Ez heta êvarê li marangozخانهya xwe dimam, dixebitîm. Êvarê dema ku ez diçûme malê min dest bi xebatên xwe dikir. Şevê ez du saet, sê saet radizam. Hema bibêje ji çar saetan zêdetir ez ranedizam. A bi vî awayî min xebata xwe dikir.

Ê min, ku ez zehf betal bimînim ez diwestim. Dema ku ez dixebitîm, wexta min ji min diçe.

Anxaz wê wextê gava ez sê çar şevan ranezama min îdare nedikir. Îhtiyaca min bi xewê hebû. Ji xeynî xewê îhtiyaca min bi îstîrhetê tune bû.

Îcar niha ku ez şevê ranezîm, şeva din ez nikarim bixebitîm. Şevê di navbera sê saet, pênc saetan de ez radizîm.

*Hûn di rojnameya Demokrasiyê de şexsiyetên kurdan didine naskirin; bi taybetî jî li ser kesên ku niha naçin. Çi bû sebeb ku hûn bi navê "portreyan" wan bi me didine nasîn?*

□ Du xebat di destên min de hebûn. Min nedixwest ez van xebatan bi xwe re bibime gorê. Lewre li wirê ji min re lazim nabûn.

Min gelek kes nas dikirin, ku hevaltîya me, dan û standinên me bi hev re çêbûbûn. Her wiha, kesên ku têkiliya me bi hev re çênebûbûn hene ku der heqê wan de malû-

matên min hene.

Me bi hev re siyaseta kiribû, em bi hev re ketibûn hepsê, em çûbûn mêvaniya hev...

Yek jê jî meseleya kultura kurdî ye. Min dixwest ku ez herduyan jî binivîsim.

Li ser kultura kurdî, bi qederê salekê beriya niha, min di Özgür Politikayê de dest pê kir wekî meqaleyan ew nivîsandin.

Min dixwest ku ez bi kurdî binivîsim, nebû. Min çih peyde nekir. Rewşenê tîra min nedikir. Mehê carekê diweşiya. Rojnameyê din jî min nedikariya ez di wan de

kurdan jî me re binivîsin." Kêfa min jî wê yekê re hat. Lewre min jî dixwest ez wê bikim û min dest pê kir nivîsand.

Îcar portreyên min jî sê desteyan pêk tên.

1. Ew kesên ku me bi hev re hevaltî kiriye, me hev nas kiriye û mirine.

2. Ew ên ku me hev neditiye, hevaltî nekiriye û mirine.

3. Ew ên ku me bi hev re hevaltî kiriye û sax in.

*Wekî pirtûk hûn difikirin ku wan çap*



**F**êqî Huseyn: Endamê Heyeta Kargerîyê ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û Serokê Komîsyona Zimanê Kurdî ye. Ew di sala 1926'an de li gundê Xorosê ku li ser Hîzana Bilîsê ye hatiye dinyayê.

Di sala 1938'an de li medreseyê dest bi xwendinê kiriye û çar salan dom kiriye. Di sala 1965'an de ketiye nav PDK-T'yê, piştî ku di nav DP û YTP'ê de xebitiye. Gelek caran hatiye girtin û darizandin.

Der barê dozên wî de biryarên bêtaqibiyê hatiye dayîn.

Heta niha sê pirtûkên wî çap bûne:

1. "Hêmana Rêzîmanê Kurdî"
2. "Pêşeriya hewisîna zimanê kurdî (1)"
3. "Pêşeriya hewisîna zimanê kurdî (2)"

binivîsim, bi kurdî.

Her hefte, roja yekşemê nivîseke min a li ser çanda kurdî di Özgür Politikayê de derdikeve. Bi rastî min dixwest ez van nivîsan bidim Demokrasiyê. Lê beriya ku ew dest bi weşanê bike, Özgür Politikayê jî min xwestibû.

Piştî ku Demokrasiyê jî vebû, wan jî ji min nivîs xwestin. Lê bi tirkî. Min gote wan ku ez li ser çandê jî Özgür Politikayê re dinivîsim, hûn jî min çî dixwazin. Gotin: "Em dixwazin hûn li ser şexsiyetên

bikin?"

□ Belê ez difikirim, hem li ser çanda kurdî û hem jî li ser şexsiyetên kurdan.

*Pirseke aktuel ez dixwazim ji we bikim. Ji ber ku hûn xwedî tecrûbe ne jî. Bi ya we rewşenbîrê divê partiyê bin an na?*

□ Rewşenbîr ew e ku xelkê xwe rewşen dîke. Îcar bi qelesa xwe rewşen dîke, bi xebata xwe rewşen dîke, bi agirberdana canê xwe rewşen dîke... Jixwe nav li serê ye. Yanê ew ê ku şewq, şuhlê dide derdo-

ra xwe. Şewqa li ser heqiyê, ne ya neheqiyê.

Rewşenbîr, jî Farqînê ye, divê pêşî şewqa xwe bide Farqînê. Farqîn li ser Diyarbekirê ye, îcar divê şewqa xwe bide Diyarbekirê. Kurd be, divê jî kurdan re be. Xelkê Rojhilat e, divê jî Rojhilat re be.

Divê rewşenbîr jî devera xwe dest pê bike û şewqa ku dide dora xwe berfirehtir bike. Rewşenbîrî ev e.

*Me partiyêbûn û nebûyina rewşenbîrê jî we pirsibû?*

□ Îro, roja rêxistinbûniyê ye. Cañan ez di xebirdanên xwe de jî behs dikim. Ji kurdan re dibêjin ku ji nesla şêr e û ji tirkîkan re jî dibêjin ji nesla gur e. Rast e. Ehlaqê wan jî ehlaqê gur e. Ehlaqê kurdan jî ehlaqê şêr e.

Di dinyayê de du şer bi hev re nagerin. Her yek bi serê xwe digere. Tu wext du şer bi hev re qesta necîrê nacin. Gava ku tişteki wisa bibe, bi hev digerin. Yek yekî dixemqîne.

Lê hemû heywanên din alikariya necîrê jî hev dixwazin. Mesela gur, bi revde digîne necîrê.

Şer tu wextê bi hevala xwe re jî nagerin. Heywanên din ne wisan in. Îcar bila em şer nebin, em bi revde bin.

Bihevrebûn şert e. Vêca ew bihevrebûn, di partiyên de, di yekîtiyên wekî doktoran, mamosteyan, nivîskaran, ebûqatan, muhendîsan û hwd. de dibe ew dizane.

*Emrê we tam heftê. Nêzîkî 50 sal e ku hûn bi siyaseta mijûl bûne. Wê demê we bawer dikir ku wê doza kurdan were wê sewiyeya îro?*

□ Wexta em bi siyaseta mijûl dibûn, li cihêki wekî Tetwanê ku zivistanan berf jî bejna mirovekî zêdetir diket û mala me jî ji taxê bi qederê pênc sed metroyî dûr bû, tu xanî jî li dorê tune bûn. Îmkana ku mirov derketana derve jî tune bû. Hingî sar bû. Hevalên me yên ku me bi hev re rêxistin danibû, wexta ku bihatana malê û me jî xwe re xeber bida, me mutleq nabadarek datanî ber malê.

Îcar ew xebirdanên me çî bûn? Ew xebirdanên ku îro em di salonan de, di konferansan de dikin, wê wextê dehyeka wan jî me nedikarî di mala xwe de xeber bida, di wê zivistanê de.

Em gelekî bi pêş ve çûne. Lê baweriya me ew qas tune bû, wê wextê. Me digot em di emrê xwe de van tiştan nabînin. Min digot emrê min sed sal be jî kurd nagihîjin wê sewiyeyê.

*Xebatên we yên ku li ber çapê ne hene?*

□ Du sê pirtûkên min ên ku li ber çapê ne hene. Yek jê bi navê Hewisîna zimanê kurdî (3) ye. A din jî bi qederê 100 rûpelên daktîloyê fahi hene; çirokên li ser heywanan in, ji nava gel hatine berhevkirin. Ez dixwazim digel resman wê biweşînim, bi awayekî rengîn.

Seyahetnameyên min hene. Ew cihên ku ez çûme lê geriyame. Mesela meşeke me hebû, di sala 1993'yan de. Ji Bonnê heta Brukselê çêbû. Min, hemû tiştên ku me di dema meşê de kirine, li me qewimîne, nivîsîne. Seyahetêke min jî li Başûrê Kurdistanê çêbû. Tev bi qederê du pirtûkan hene. Wekî din jî min peyv berhev kirine. Bi qederê 15-20 hezarî. Bi kurdî-tirkî li ber hev min ew nivîsîne. Ne bi awayekî alfabetîk.

# Bilbilekî şeyda: Evdirehmanê Mizûrî

**X**weş mirovekî kurdperwer û evîndarê çavên rastiye û ro-nahiyê mamosta Evdirehmanê Mizûrî, di sala 1946'ê zayînî de, li gundê Êtûtê ku bi ser devera Behdînan ve ye, wekî ku ew bi xwe dibêje "ji dinyayeke tarî mişextî dinyayeke tarîtir dibe." Li gorî gotina wî, (ji paşgotina wî ya 'ji evîna çirayên kevin') hîna 'di sêyemîn pola navincî de dikeve westîka helbestvanîyê û "dengê Xanî, Nalbendî û Cegerxwînî dergehê hizra (ramana) wî diqutin."

Mizûrî, "di sala 1967'an de dara wî ber digire (lê ji vî berî), hin kerik û hinek nivgehiştî bûne," dibêje.

Li gorî daxuyakirina wî, her di vî salê de, di kovar û rojnameyên Iraqî, mîna Beyan, Birayetî, Hawkarî, Iraq, Jin û Nûserî Kurd de helbestên xwe weşandine. Diwana wî ya yekemîn 'Ji evîna çirayên kevin' e û di sala li gorî gotina wî "evê diwana sinêla (ne balix) ku ji genimê gelek salan kom kiriye û di sala 1979'an de çap kiriye."

Hêjayî gotinê ye ku mamosta Mizûrî, ji van salên ku ew ji dibêje û heta bi Serhildana 1991'ê di kovar û rojnameyên Iraqê de, bi zimanê erebî û kurdî li ser rewîşt, tore û kelepura kurdî gelek gotar û nivîsinên berkeftî darjitime û tu caran ji rewşa dijwar a welatê xwe û ji jiyana gelê xwe ya bêsêrûber dîr neketiye û hemû gavan xemxurê xak û gelê xwe bûye...

## Welat:

Ne min genc û xezîne ne  
Ev ro ji bêjîna te ra bidem  
Ne min pelgezêrîne ne  
Hindav serê te ez vedem  
Ne min stran û lawje ne  
Li te veşêrim yan nedem.  
Welatê min, min çi heye?  
Ev e dilê min sêveka Berwariyan e  
Dê havêjim  
Li sîngê te dem  
Li sîngê te dem.

Belê, her çende helbestvanê me di dema Şoreşa Gulanê de (1976-1990) li nav hikûmetê jî bû (wê hingê li Dihokê, li Amadeyîya Birayetî mamostayê toreyî bû) lê, bi dil û mêjiyê xwe bi bizava gelê xwe re bû û hemû gavan pesindarê gel û mêjûya xwe bûye:

Heger ez şahînek bama û gotibana min;

Lo şahîno, xemkomkero xemcemîno  
Çima dengê te nahêtin?  
Takê ku te dadaye ser  
Nabîlînd bit û dihejêftn...  
Da bêjim ez?!  
Tava barana dengê min  
Çik nebûye û her dêhêtin.  
Ji mêje bapîrê min gotiye:  
Çonga av lê çûye carekê  
Dê her lê çit û dê zêtin  
Evîna cama dilê me mişt kirî  
Ne xwar dibe û ne tê rêtin  
Ew (Mêhrebana Berwarî).



**Piştî tîkçûna şoreşa gelê kurd di sala 1975'an de, wek noka ku li kevir keve, gelê kurd li başûrê welatê xwe wisa naçar û derbeder ji hev belawela dibe. Tirs, rev, naçarî û bêhêvîti, wek pelehewrekî tarî û ziwa bi ser gelê kurd de vedigire. Yek ji wan jar û perîşanan jî E.Rehmanê Mizûrî bû. Wî jî êş û xemgîniya xwe, belê bi hêviyê xurt dianî ziman...**

Hindî şevan dirêj bitin  
Sipêdê meşka xwe dê kêtin.  
Nebêje min mîwê edî nadetin tirî  
Nebêje min bazê ji hêlinê firî  
Nebêje min (Derwêşê Evdî) yê mirî  
Êdî şepale (Edlayê) narevêtin  
Nebêje min, nebêje min...  
Piştî tîkçûna şoreşa gelê kurd di sala 1975'an de, wekî noka ku li kevir keve, gelê kurd li başûrê welatê xwe wisa naçar û derbeder ji hev belawela dibe. Tirs, rev, naçarî û bêhêvîti, wek pelehewrekî tarî û ziwa bi ser gelê kurd de vedigire. Her kes û her derê welat jar û perîşan di bin vî pelehewrê tarî û ziwa de diariya,

dinaliya û dikaliya. Yek ji wan jar û perîşanan jî Evdirehmanê Mizûrî bû. Wî jî êş û xemgîniya xwe, belê bi hêviyê xurt wisa dianî ziman:

Evrazî:  
Rast e gelo,  
Hemî karwanîyên dilê min sernîşiv çûn.  
Piştî xwe dane serekaniyan û  
Bo warekî kind û nizim  
Bênan û bêpaşiv çûn.  
Bila biçin...  
Dê kîve çin?!  
Gava nişivî wan birî, 'dê evraz bin

Dê bilind û serfiraz bin.  
Lewra gelo, di xema karwanîyan nin im

Çunkî piştî nişivîya  
Stêra evraziya dibînim  
Stêra evraziya dibînim.

Mamosta Mizûrî wekî gelek hevalên xwe yê nivîskar û helbestvanên welatperwer, di cergê hikûmeta Iraqê ya faşîst de şoreşa wêjeya neteweyî dida. Ew ne bes helbestvanekî zimantûj bû, her wisa bi gotar û lêgerînên xwe yê li ser kelepore û toreya kurdî jî, dida xuyakirin ku qelemşorekî pehlîwan e.

Piştî çapkirina yekemîn diwana xwe ya bi navê "Ji evîna çirayên kevin" ku ji şanzdeh helbestên berkeftî pêk hatiye, di destpêka salên 1980'yan de, digel çend hevalên xwe dest bi weşana kovareke bi navê "Dengê Me" kirin. Berî serhildana 1991'ê, duwemîn diwana xwe bi navê "Li xelkê tahlê, li min şêrîne" weşand. Di sala 1993'yan de li Dihokê, digel hinek hevalên xwe kovarek bi navê "Serhildan" derdixistin.

Di encama vî danasîna mamosta Mizûrî de, di qorzikên çavên re jî be, rexneyeke me ya biçûk heye. Helbet, her babetekî zanistî, zimanekî xwe yê taybet heye. Bo nimûne; gava ku romanek tê amadekirin, heger ew roman bi şeweyê xwecihî bête nivîsandin, bêguman wê hîn xweştir û bi tehmîr be. Lê gava ku ev nivîs helbest be, wêneyê helbestî çend bilind dibe bila bibe, heger helbestvan jî gêra devera xwe dermekeve û di deryaya ziman de melevaniyê neke û berhemê xwe yê helbestî bi zimanekî berfireh danerêje, ew helbest li dûv daxwazê, tehmê nade û bilindiya wêneyê helbestî jî di nav wê bêtehmîyê de winda dibe, diyar nabe. Vêca mamosta Mizûrî yê ku (bêpesindarî) di deryaya ziman û kelepura kurdî de jîr û melevan e, divêt zanibe ku gêra li navbera Sêmêlê, Êtûtê û Berwariyan jî bo pehlewanekî wek wî gelekî berteng e!

Digel daxwaza me ya jiyekî dirêj û serfirazî di rîya kurdewarîyê de bo mamosta Mizûrî, emê nivîsîna xwe bi parçe helbesteke wî ya "Ji evîna çirayên kevin" bi dûmahîk binin.

Herîrî:  
Perîxanê Perîxanê,  
Şî'r neman min bo çavên te neristin  
Agir neman,  
Sexmeratgeşîya rûyê te neperistin...  
Ji nişka ve, sîbera te li me wergeriya  
Lewa em perîşan û pest in.  
Perîxanê, bizivreve  
Maziçînên mazîka me li hêviya te ne  
Melokvanên zevîka me li hêviya te ne  
Bizivreve,  
Melokên me bike genim  
Xwezîkên me bike baran; bike şevnîm  
Da ez jî yar,  
Bi bêjîna te ya şêrîna û xwar  
Têr bikenim  
Têr bikenim...

DILDAR ŞEKO



● **NAVENDÊN ÇANDÊ**, partî, sendîka û komeleyan çalakîyên di vê heftiyê de.

● **31.8.1996 Şemî**, "Zincîra Aştiyê", li nîk Atatürk Kûltûr Merkezi (AKM)-Taksim. Saet: 13.00-14.30, amadekar: DBP, HADEP, IHD, KESK, ÖDP, SINE-SEN

● **1.9.1996 Yekşem**, Pîrozkirina roja aştiya cihanê, AKM, Taksim. Saet: 20.00  
Şahiya aştiyê, Yedikule Zindanlari, Edip Akbayram, Ferhat Tunç,

saet: 19.00

Şahiya karikatûrên aştiyê "NE ŞEHİTTİR NE GAZİ...NİYAZI". Karikatûrlar Derneği, Alemdar Cad. Yerebatan Sarmıcı Çukuş-Sultanahmet.

Li Evrensel Kûltûr Merkezi:

● **1.9.1996 Yekşem**, Forum: "Barışla yaşar çocuklar." (Digel aştiyê dijîn zarok), "Barış için konuşuyor çocuklar" (Ji bo aştiyê dipeyvîn zarok), pêşangeh: "Çocuk Kalemden Barış", (Ji Pênûsa zarokî aşî), saet: 11.00

## RÛDAN

# Tiştêkî we di vî çiyayî de tune



**"Ê ma mirov tiştê xwe dişewitîne? Ku tiştêkî we di vî çiyayî de hebûya weyê bişewitanda, weyê agir berda rez û dehla xwe?"**

**L**i gundekî ji Herêma Omeriyan mirovek bi navê Xalê Şukrî, rojekê li gund bi serbazekî tirk re sohbet dikir, jê re henek û pêkenok digotin. Di nav vê sohbet û henekan de ji serbazê tirk re dibêje:

– A nika ez tiştêkî bibêjim tu naxeyidî?

Serbaz: "Na na ez naxeyidim."

Piştî ku soz da ku wê nexeyide Xalê Şukrî dibêje:

– Ev çiyayên ku hûn dişewitandin tiştêkî we tê de tune.

Serbaz:

– Çawa tu wiha dibêjî?

Xalê Şukrî:

– Ê ma mirov tiştê xwe dişewitîne, ku tiştêkî we di vî çiyayî de hebûya weyê bişewitanda, weyê agir berda rez û dehla xwe?

Serbazê tirk deng jê nayê, hema radibe û bi leşkerên xwe ve ji gund derdike ve.

Gelo rastiyeke ji vê mezintir heye û kî kare bêjê ev tişt ne wilo ye? Ew serbazê ku fermana şewitandina daristanên li Kurdistanê dide, gelo kare vê fermanê li Tirkîyeyê jî bide û daristanê bişewitîne? Na vê fermanê nade, ne

bes nade, li ser şewitandina daristanên ku bêhemdî agir pê ketiye, digirin, dibêjin:

– Kezeba me disoje; dahatûya me dişewite.

Pisporên wan dibêjin nizamim, di çiqas demê de ev daristan dikarin bigihin mîna rewşa xwe ya berê.

Lê li xwe nazivirin, nabêjin ma em çi dikin, heger li Tirkîyeyê daristan û kurmik tene şewitandin, li Kurdistanê ne daristan û kurmik tenê, mirov jî tene şewitandin.

Ew şûjina di çavên xwe de nabînin, derziya di çavên hevalê xwe de dibînin. De ka bibêjin em li ser çi bigirin? Li ser kurmik û çivikan an li ser zarok û mirovan.

Bi hezaran gund hatine valakirin û wêrankirin, bi milyon kes ji cih û warên xwe bûnc, tazî mane li ber seqem û baranê. Erê daristan û seyrangehên Tirkîyeyê şewitîn, lê mirov nehatin şewitandin, perîşan û xizan nebûn, kesek ji cihê xwe koç nebû; li ber berf û seqemê nema.

Êdî bila rayedarên tirk vê fêman bikin, hetanî şûjin hebe kesek li derziyê nanêre.

REMEZANÊ HÛRÎ

## TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



### Dîsan minare bejin ziraveke

**K**urd ciwanî wituwe: Minare dizîn asan e, belam şardinewey giran e. Dûjmanî azadî û wekhevî bo çil û pênc roj minarey bejin ziravî deng û rengmîyan dizî... Belam çi lêbiken?! Ew kêwe le kwê da bişarnewe û le çi oqyanûsêk da sengî ew bange bingom biken.

Ew rojey ke biryarî daxistinî em pencere gewreye be naçarî qubul kira, min hestim wekû bûn û wekû cestay welatekem parçe parçe bû. Xefet û meroqêkî dijwar le cestay ala bû. Welê ramanêkî xestîş mîşikmî derzî ajin dekirî...

Gelo boçî debê wabê?! Be heman dax û hesretewe çûme jê reşmalî bername zînduwekey dwa şewî MED ewe. Le wê da witim: Siteme mirovêk ke dexwazê gerwî bikate derbendî şadîmanî û sitranî serfirazî tê da bo mirovayetî biçrê, demî dabixeyt û neteqêt. Belê sitem e. Belam teqînî emro wekû hî dwênê niye, ke tenha ziyan be xoman bigeyenêt, belkû debê û pêwîst e teqînî emroman neyarani dewrûberman tar û mar bikat. Ew neyaraney ke serman debrin, dengman qut deken û zimanman jê deken.

Dway çil û pênc rojîş şiyaw û le bare pende kurdiyekey lemer xoman bikem be kilîlî barkirdin û pîrozbayî ser le nwê çaw helhênanewey MED-TV. Îtir ew roje roy şitekanman biden be kol da û be rojî nîwero bîdzin û bîken be jêr lêwî hovaneyanewe. Nazanin û agayan lê niye ke tenha rêjney dabarinî telefonî narezayî xelkî çî rûbarêkî be xûr pêkdênêt. Bê xeber in le wey ke kurd amadey hemû core tole heldanêkin le pay kwêrkirdin ew çawe ciwane da.

MED-TV darêkî bê kes û dirextêkî bê evîn niye. Sûreçinarêke le naxî xelkewe helçuwe. Darêkî bê gela û gûl, bê saye û sêber niye. Rût û tenha be girey agirînyan wişik helatibê û be reşebayek destekanî, qolekanî û peraswekanî wird û xaş bibin. Be tema mebin îdî çinarî hevîman tîk û pêk bişkêt. Na be tema mebin.

Dûjmanî dîmokrasi ke çawyan be bîninî MED berayî naye, neyantwanî ew pencereye bo hemîşe kwêr biken. Ewan be zimanî mijdebexşewe hewalî kwêrkirdinî em çawe hoşyareyan pexş û bilaw kirdewe. Be "Türkiye'nin zaferi" be nawyan kird. Le hemû ekranekanî xoyanewe dengî gîrawî minare bejin ziravekeyan be gwêy hemwanda çirpand û reşpoşî rengîşyan xiste ber dil û dîde...

Belam hemû ewane bûn be xewnî zir û MED-TV dîsan be rengêkî ciwantir, be dengêkî zûlaltir û be hegbeyekî pirtirewe hatewe amêzî evînî xelkî û reşî firêda û kirasî alûwala û gûl rengî poşî.

Em xore çon helhatewe û çon dir be leşkerî tarîkî dira? Le katêk da şewqî MED çawî şemşemkwêrekan kwêrtir deqat, min beyte be nawanagekey Pîremêrdî Nemir im birdekewêtewe:

Wa roj helat le bendenî berzî welatewe

Xwênî şehîde rengî şefeq şewq dedatewe.

# Derewên bêzirar

**L**i Kurdistanê di şevên zivistanê yên dirêj de, dost û pis-mam li malên hev dicivyan û li ser mijarên cur bi cur gotûbêj dikirin. Dema ku mijarên wan ên gotûbêjê biqediya, îcar dest bi tiştên pêkenokî û derewên bêzirar dikirin.

Disa rojekê li malekê dicivin û dest bi derewên xwe yên meşhûr dikin. Yek dibêje: "Di şerê li navbera tirk û ûris de, em tevî gundî û malbatên xwe koçber bûn. Dema em çûn, me di mereka (kadîn) xwe de mirîşkek ji bîr kiribû. Piştî çend salan em veşeriyên gundê xwe, ez çûm min deriyê merekê vekir, min dît ku tiji hêk e. Me hêk kişandin benderê, kama ga da ser, li aliyekî dîk, li aliyekî mirîşk firiyar"

Yekî din radiibe dibêje: "Ma mala virên te bişewitin, virên xelkê kavir in yên te çûcîk in."

Carinan ji rê li ber derewên hev digirtin. Yek dibêje: "Wele ez serê sibe-hê rabûm min bihist ku, dengê kûçikan ji ezman tê, dema min serê xwe bilind kir min dît ku çî.. kûçikek difire." Yekî din dibêje: "Rast e teyrekî cewrikek xistibû devê xwe û difriya, min jî dît"

Disa yek dibêje: "Ma kalikê min hostayekî pir ecêb û mezin bû. Her tim qala hostetiya xwe dikir, rojekê ez jî pê re çûm cihê karê wî, min dît çî...? Beroseke wisa mezin çêkirine ku zêdetirî sed kesî di nav de dixebitin, lê dengê çakûçên wan naçe hev û din." Yekî din radiibe dibêje: "Ma lawo cihê karê kalikê te li cehenemê ye? Qey wisa mezin e?"

Disa yek dest pê dibe dibêje: "Em çûbûn mîşeyê (daristan), şev bû her der reş û tarî bû. Ezê tam biketama xewê, min bihist ku dengê mirovan wisa tê wîîîîîî ziya weyyyy bavo birevin hat. Ez rabûm ser xwe min dît çî? Ziya mîşe tevî berhev kiriye, daye ser piştê xwe û ber bi me dimeşe. Min got ya Allah kêrika xwe kişand. Çawa yek di zikê wî re kir, kete erdê êdî hew rabû ser xwe."



Yekî din dest davêje bêrika xwe çemê marekî derdixe dibêje: "Ma lawo ziyayê çî bû, tîremar bû. Aha ev jî çemê wî ye."

Yekî din dest bi derewên xwe dibe dibêje: "Wele dema benderan bû. Du heb gayên me hebûn. Roj di hate nîvro em çûn ku firavînê bixwin. Dema em hatin benderê me dît ku gayên me winda ne. Me bender qedand. Em çûne êş, me genimê xwe lê kir, kire ard anî mala xwe. Êdî zivistan e; diya min tenûr pêxistiye, nan dipêje, nanek dudo ji tenûr derxistin, wisa pijiyane û nepixîne. Dilê min wisa avêtê, min hilda kire du parçe. Min dît ku çî her du gayên me bûne fişefîşa wan ji nava nêr derketin."

Civat giştik bi hev re radibine piyan dibêjin: "Wey lawooooo, ev çîîîî derew, bi Xwedê derewê te ji yê Xwedê jî mezintir in."

Îcar yekî din dest pê dibe: "Wele pîrikeke min hebû, wisa bixîret bû wisa karê mezin dikir ku tu kesî nikaribû wekî wê kar bikira. Teşteke wê hebû cihê sih kod genim bû di wê teştê de nan dipet. Îca wê teştê hevîr dixiste şes nana." Civat dîsa şaş dima digotin: "Ma lawo pîrika te ji artêşê re nêr dipet qey?"

Şev nediqediya îcarê diçûne dorê mele, digotin: "ka mele tu jî derewekî bike." Îcar jî mele dest pê dibe: "Wele ez çûme gundekî min dît ku tu kes li gund tune. Min çend rojan li mizgeftê bang da û nimêj kir tu kes nehat. Ez li derdorê geriyam tu kes tune bû. Min got wele wiha nabe pêwîst e ez ji xwe re civatekî bibînim û li pêş wan nimêjê bikim. Ez çûm ber daristanê min ji daran şiklê mirovan çêkir û di ser wan de xwend rih di giştikan de hat bûn mirov. Min bi wî awayî ji xwe re civatek çêkir."

"Wey mele Xwedê mala te xerabike karekî din tune bû te çû ji daran mirov çêkir"

M. AGIRI

## Rovî û Jûjî

**R**ojekê ji rojan, rehme li dê û bavê hazir û guhdaran, lê ji xeynî cendirme, Bekoyê Ewan û kedxwaran. Hebû jûjiyek û roviyek. Her yek ji wan serokê eşîrekê bûn û xezîneya wan a zêran hebû. Jiyana her duyan jî di nav keleke kevnarî de derbas dibû. Rojekê li devê xwe şehetîn, xezîneya zêran a wan ku hebû ji hev re gotin. Di dawiyê de jûjî û roví li hew rûniştin, ji xwe re peyivîn.

Ji hev du re gotin ku ew her du jî axa ne, her yek ji wan xwediyê xezîneyê ne

û ji niha û pê ve jiyana xwe bikin yek û bibin destbirak.

Lê di serê herdukan de jî daxwaza bidestxistina serokatiyê hebû. Ne jûjî ji roví bawer e, ne jî roví ji jûjî bawer bû. Gelekî dom nekir rojekê roví got:

"Binêr wexta ku bavê min rehmet nebûbû, serokatî di dest bavê min de bû. Fikra min a din jî, ji ber ku ez zane û kevnar im, hiş û fikrên salan û deman di serê min de hene, gere ez bibim mezin. A din jî wekî tu dizanî, du axa di kelekê de nabe."

Lê jûjî wexta ev tişt bihistin, parçe ji xwe kir û ew daxwazên roví qebûl nekirin. Rovî got: "Madem tu qebûl nakî serokatîya min, wê çaxê emê bi şert û şîrûdan biavêjin ber hev du."

Jûjî ev yek pejirand. Got: "Ma şert û şîrûdên me li ser çî bin",

Rovî:

"Bila li ser kevnariyê be."

Jûjî: "Bila be, kekê roví."

Rovî:

"De birakê jûjî kanê sozê bigire û kevnariya xwe bibêje?"

Jûjî:

"Birakê roví ger pêşî tu soz bigirî?"

Rovî:

"Estexfurullah weleh birakê jûjî, pêşî tu sozê bigire."

Li ser vê yekê jûjî hew xwe girt û dest bi çîroka kevnariya xwe kir:

"Ez di zemanê Sefîna Nebî Nuh de çêbûm."

Wexta jûjî qala kevnariya xwe kir, roví kesereke kûr kişand û hêstirên sextekariyê ji çavên xwe barandin. Wexta jûjî roví di wî halî de dît, devê xwe girt û ji roví re got:

"Ev çî kesera bi dilşewat bû ji bo navê Xwedê ka derdê xwe ji min re bêje."

Rovî got:

"Ma birakê jûjî ez çî bibêjim, te dîsa kulên min tev radan, roví du lawên min wê çaxê hebûn, mîr bûn, xort bûn; xulamê te bin. Di ber Sefîna Nebî Nuh de çûn xeniqîn."

Jûjî fêr kir ku lawê roví jê kevnartir e, êdî deng nekir, piştê stûyê xwe xurand û berê xwe da welatekî dûr.

Çû bi rîka çûn û nehatê.

Piştî ku jûjî çû, roví taca serokatiyê da serê xwe, roví xezîneya jûjî jî, ji bo şexsê xwe xerc kir.

Di zemanekî nêzîk de ew kela xwe ya jiyane ji bo berjewendiyên xwe yên gemarî bi erzani da destê gur û hirçan.

KOMA ZOZAN Û HEVALÊ MÊNAL

# Stêra Kurdan

**Heft salan berî niha Yoshikazu Yasuhiko xêzeçirokek çêkir, bi navê "Kurudo no Hoshi" angî Stêra Kurdan. A rast li Japonyayê vê demê hebûna kurdan baş nedihat zanîn, ji ber vê yekê pirtûk baş nehat firotin. Lê, mirovên japonî bi nivîsîna vê pirtûkê bi hebûna kurdan hesiyan.**

Japonya wekî welatê xêzeçirok û xêzepêkenok (karikartûran) tê zanîn. Xêzeçirok ne tenê ji bo zarokan, her wiha ji bo mirovên mezin in jî. Çîrokên wan xêzan xweş hatine honandin û ew wekî şeweyekî romanê yan şaxeke wêjeyê ne. Ji van pêkenokên xêzkirî yên ji bo mezinan re romanên nîgarkirî tê gotin.

Yoshikazu Yasuhiko yek ji nivîskarên xêzan ên navdar ên japonî ye. Berhema wî ya herî navdar çîroka zanista nîgaşî (scientific fiction) ya bi navê "Kidou Senshi Gundam" e. Di vê çîrokê de robotên mezin li fezaya ayandeyê şer dikin. Bi vê berhema xwe wî 15 salî berî niha gelekî nav û deng da û ew bi ser ket. Ev berhema wekî filmê xêzkirî di televîzyonê gelek welatan de hate nimandin.

Heft salan berî niha Yoshikazu Yasuhiko xêzeçirokek çêkir, bi navê "Kurudo no Hoshi" angî Stêra Kurdan. A rast li Japonyayê vê demê hebûna kurdan baş nehat zanîn, ji ber vê yekê pirtûk baş nehat firotin. Lê, ji bo mirovên japonî nivîsîna vê pirtûkê tiştêkî girîng e, ji ber ku ew bi vê pirtûkê bi hebûna kurdan hesiyan. Em der barê naveroka pirtûkê de jî hinek agahiyan bidin.

Xortê bi navê Jiro Manabe ku bavê wî profesorekî japonî û diya wî keça serokeşîreke kurd e, ji bo nas kirina kalikên xwe û dîtina dê û bavê yên windabûyî, dikeve dû şopa wan.

Li Stenbolê ew şervanê kurd Demiler (destê hesin) nas dike. Demiler gelekî hez ji wî dike û li nav eşîra xwe wî wekî peyrewê xwe destnîşan dike. Jiro di destpêkê de naxwaze peyrewiyê bipejirîne, lê paşê di qonaxa jiyana rojane de ku digel Demiler derbas dike, hêdî hêdî dibe xwediyê nasnava kurdî û teklîfa Demiler dipejirîne. Her wiha ew dibe şervanekî kurd û dikeve nava şerê li hemberî tirkan jî.

Çîrok bi gav bi gav dikeve dirûvê çîrokeke evînî û macerayê. Dilê Jiro dikeve keçeke kurd a bi navê Urma, mezin dibe û dest bi meşeke leşkerî ya dirêj dike; ji Stenbolê ta Hewlêrê, ji wir jî heta Agiriyê Mezin tî, ji wir jî diçin heta Bazîdê. Ew li Bazîdê rastî bavê xwe tê, lê bavê wî bîrkor bûye. Jiro û bavê wî diçin çiyayê Agirî ku li diya wî bigerin. Di vê demê de hêzên rûsî û hêzên tirk di şer de ne. Diya wî jî laboratuareke azmûnên li ser laşên mirovan a rûsan (a li baregehekî nehênî) ye. Di şer de ew bavê xwe jî winda dike û biryar dide ku bibe şervanekî kurd î rastîn.

Berî deh salan nivîskar Yoshikazu Yasuhiko tê Tirkîyeyê ji bo ku li ser Kurdistanê hinek agahiyan bi dest bixe, da ku di xêzeçîroka xwe de bi kar bîne. Ew dide zanîn ku gelekî di bin bandora tore û çanda kurdî de maye. Lê mixabin wî nekariye bi qasî ku ew karibe kurdan baş binase, melzeme berhev bike. Lewre di pirtûkê de li ser navên kurdî û cil û bergên wan ên kevneşopî gelek tiştên çewt cih girtine. Lê belê pirtûk bi xwe gelekî girîng e ji bo mirovên japon, ji bo ku ew der barê kurdan de bibin xwedî agahî.



Yoshikazu Yasuhiko di paşgotina pirtûkê de wiha dinivîse:

"Gelê ku wekî kurd tê binavkirin û li Kurdistanê dijî, di hezar salên pêşerojê de wê her hebin, heke ew bi gelek astengiyan re rû bi rû bimînin jî. Her wekî çawa ku ew ji koçberkiriya girseyî ya Mustafa Kemal û hevalbendên wî rizgar bûn. Di pêvajoya dirokê de tu kesî nekarî kurdan ji dilêriya wan bike. Ew dilêriya wan ji ku tê? Em, japoniyên ku wekî gihayê bêreh in, vê yekê bi hêsanî nikarin fêhm bikin. Lê gelekî bi me xweş hatin, ew mirovên ku xwediyê vê cesaretê mezin in."

SERVÎSA ÇANDÊ

## Şehîdên hezkirinê

DILBIXWÎN DARA



Eger ez mirim, wesiyeta min ew e ku hûn li ser cenazeyê min bisekinin, berê xwe bidin Agirî û bi dengê bang bikin: Agirî... Agirî... Elî bi hesreta dîtina te çû. Ez ji we rica dikim, dilê min di nava agirê hesretê de neşewitînin, bila ez di nava dîwarên gorê de newestim, min newestînin, min, rûyê min careke din nedine mirinê, bila ez careke din nemirim, ne hêsan e ku mirov du caran bimire... Ez di bextê we de me, vê wesiyeta min bi cih binin..."

Belê, dema ku ev gotin digotin, xwedanê xwe ji eniya wî diavêt, çavên wî tijî hêstir dibûn, gewriya wî teng dibû û careke din serê xwe radikir, li me dinêrî û digot:

"Wisa guman nekin ku ez bêhêvî dijîm. Rast e, temenê min çûye, porê min spî bûye, belkî çavên min jî wekî berê nikarin bibînin, lê belê di dilê min de her sibe gul vedibin, bilbil li ser wan gulan her şefeqê dixwînin... Ez bi wan hêviyan dijîm, ezê bi wan hêviyan bijîm, ezê bi wan hêviyan re jî bimirim."

Êdî ciwaniyê piştî xwe dabû wî. Kal bûbû. Eniya wî qemîçibû, ronahiya di çavên wî de jar bûbû. Dema ku diaxivî, girî ji qirika wî dihat der, mirov li ber dengê wî yê xemgîn perîşan dibû. Di her gotineke wî de, şînek hebû. Di her axîneke wî de kuştin, sirgûn û mirineke li ser rîyan hebû. Hinek caran dikeniya, lê mirov li ber kenê wî jî digirîya, di kenê wî de giriyek

hebû, qîrîna zarokekî, şîna dayîkekê, hawara bavekî û jana dilekî birîndar hebû.

Bi vî awayî min Eliyê Ebdurrehman nas kir. Berê jî min çend berhemên wî xwendibûn, lê belê min ew qasî nizanibû ku ew gelekî eşiyaye. Di nivîsên wî de êşeke mezin dihat dîtîn, lê belê dîtina wî rastiyeke din raberî min kir. Wisa ji min re diyar bû ku, her nivîskarek her demê nikare tiştên di dilê xwe de bi pênuşê bîne ziman. Dil, gelekî mezin û fireh e. Çîqas bixwaze dikare mezin û fireh bibe, tu sînor nikarin pêşîya wî bigirin. Hezkirina di dil de, her demê nikare derve derve, dinyaya li derveyî dil, ji wê hezkirinê re gelekî teng tê. Li aliyê din, di dil de hezkirin pir azad e, serbest e, dilsoz e, hezkirineke vekirî ye, bawerî heye, hêviyên mezin hene. Di dil de xapandin, derew, hevixistin û tîkçûn nîn e. Ji ber vê yekê, mirin jî hebe, her demê hezkirin dixwaze di nava dil de bimîne.

Tenê dil dikare wê hezkirinê biparêze. Bawerîya wê hezkirinê bi derve namîne, li derve di dawîya xwe de hezkirin dibe mirineke xerab, dibe kuştina Mem û Zînê. Hezkirin dibe tîrsekî. Hezkirin dibe reveke ji rastiyeke, dibe derew û her kes bi navê hezkirinê hev dixapîne. Mêr jina xwe, xort keça di nava destên xwe de, şev rojê, roj şevê, jiyana mirinê, mirin jiyane, zindî miriyan, mirî zindîyan... Her kes di bin navê hezkirinê de dest û çavên hev girê didin û hev dixapînin, bi hev dilîzin. Bi her tiştî, mirov dikare bi her tiştî bilize, lê belê bi hezkirinê na...

Mixabin, mirov her demê nikare bi xweşiya hezkirinê bihese. Ne wekî çîrokekê ye, kengê bixwazî binivîsînî, ne jî wekî xwendina romanekê yan jî wekî temaşekirina li filmekî ye. Hezkirin îlhameke mezin dixwaze, eger ku li cem mirov ew hest û îlhama mezin tune be, nikare hez bike, eger hez bike jî, wê hezkirina

wî wekî xwendina çîrokekê yan jî kurtenûçeyekê be.

Axîna Eliyê Ebdurrehman ev rastî nîşanî me dida. Hezkirina wî ji welat re, li sirgûnê çêbû, yanê piştî ku ji welat qut bû. Bi rastî jî, dema ku mirov ji welat dûr be, ew hezkirin wekî agirî di dilê mirov de her dem veketî dimîne, hinavên mirov li ber wî agirî dişewitîn.

Xwezî me jî hezkirinê hez bikira. Xwezî me bizanibûya mirov çawa hez dike, kesekî ku nizanibe riyên hezkirinê çi ne, nikare hez bike, nikare li ser rîya hezkirinê bimeşa, meşa li ser rîya hezkirinê cesaret û dilsoziyeke mezin dixwaze. Ji ber vê yekê em nikarin bi qasî mezinbûna dilê xwe ji welat hez bikin. Em hezkirina welat tenê di pirtûk û ekranên televîzyonê de dibînin. Bi çar pênc gotinan em ji welat hez dikin, bi çar pênc gotinan jî em hezkirina xwe qut dikin.

Welatekî ku her kevirêkî wî Memek e û her guleke wî jî Zînek e, eger ku mirov bi qasî evîna Mem û Zînê ji wî welatî hez neke, tu caran nikare wê evîne bi salan di dilê xwe de hilgire. Mirovê ku bi salan evîna welat ji xwe re neke barekî giran, ewê nikaribe bi hezkirinê, bi şehîdên wê hezkirinê, bi xwîna ku tevî avê bûye, bi dar û ber, bi çiyayên ku di bin her kendalekî wî de, gora şehîdekî heye, ewê tu caran nikaribe, bi germahiya laşên di bin berfê de bihese, ku tenê havînê mirov dikare rûyê wan nas bike. Dema ku havînê tê û berf dihele, wê demê em dikarin hevalên xwe yên şehîd nas bikin û rûyê wan bibînin...

Hinek caran mirov ne xwediyê wê hêzê ye ku hezkirina şehîdên hezkirinê nas bike, her demê ew hezkirin nayê naskirin, lê belê tu caran jî mirov nikare dilê xwe ji hezkirina ku her roj mezin dibe re, teng bike. Ji ber ku hezkirina welat hezkirina şehîdan bi xwe ye. Hezkirina ji şehîdan jî, hezkirina ji hezkirinê

Pesna çêleka zer

Sê diz



Çêlekeke yekî Surgicî, bêwec û jar hebû; guhan biçûk û şîrê wê ji kêmbû. Bihar û havîn derbas bûbû, kulfet têr dew nedîtibû; her çavê wan li tasek dewê cîranan bû. Erê çêleka zer bû lê, gelek serhişk û şûm bû. Dema şîr jê didotin, piyê xwe li sîtîlê dida, şîrê ku dihate dotin jî dirijand.

Bi kurtasî jî bilî xesarê tu fêde li mala xwediyê xwe nedikir. Bi ser de jî, ji sal heta salê, tab û eziyeta ku pê re diditin, di ser dilê wan de dima. Serjê kiribûna, goştê wê nedihat xwarin û firotin; bikirina dermalê, qelew nedibû. Bifirotana... Jixwe bazar lê nedibû. Eşîr giş pê hesiyabû. Ango

bûbû cirm û ketibû stûyê xwediyê xwe.

Rojekê, jina wî jê re dibêje: "Kuro, ma te nav û dengê Hesenê Racnî ne bihîstiyê?" Dibêje: "Na. Ma ew ki ye?" Jinik dibêje:

- Kuro, ew li Mêrdînê, li sûka ga cambaziyê dike. Sibe biçê nik wî; xwe bi wî bide naskirin. Bi saloxdana kurê xaltîka bûka me ye; ne biyan e. Dibe ku li me were dilovaniyê, çêleka me bifiroşe û me jê xelas bike.

Mêrik bi ya jina xwe dike, diçe Mêrdînê nik Hesenê cambaz; derdê xwe jê re şîrove dike. Bi ser de digirî û dibêje: "Ez ketim bextê te, tu-min ji wê çêleka xelas bike." Dilê He-

senê cambaz pê dişewite, dibêje: "La-wo, heta îro min pesnê malê nebaş, bi başî nedaye. Madem te xwe li min girt û ya rast ji min re got, de sibe çêleka werîne ku ez ji te re bifiroşim."

Yê Surgicî bi kêf û evîn diçe mal; wê şevê bi dilxweşî radize û dotira rojê çêleka dibe Mêrdînê, radestî Hesenê cambaz dike. Dibêje:

- Ger tu min ji vê çêleka xelas bikî, ez tu caran qenciya ji bir nakim.

Diçe li kuçekê rûdine û Hesenê cambaz dest bi pesindayîna çêleka dike û dibêje:

- Ev çêleka zer e, cins û celebê wê zor pède dibe. Wele, tele, bile ji heft rojan pê ve golik li ber namîne. Xelk dikevin rêzê, ji xwe re dibin. Her roj du sîtîl şîr dide. Sewaleke sernerm e; ji êvarê ta beyanê tu dikarî di nava piyên wê de razêy, qet nalive. Yê ku ev çêleka li ber derê wî be, tu caran xêr û bereket ji mala wî kêmbû û poşman jî nabe...

Dem a ku Hesenê cambaz bi vî awayî pesnê çêleka dide, yê Surgicî bi heft dilan dil dikeve çêleka xwe, bi lez tî nik yê cambaz û dibêje: "Xalê Hesen, xalê Hesen!" Yê cambaz dibêje: "Çi ye kuro?" Ew dibêje: "Xalê Hesen, ez di bextê te û Xwedê de, heger tu dizanî ku çêleka min ev çend baş û rind e, ka em wê nefiroşin..."

Î.OMERÎ

Rojekê sê hevalên ku yek kurd bûye, yek tirk, yek jî ecem bûye diçine dizîya tîrî. Dikevine nava baxçe, dibînin ku hewzekî avê li ber jî kerek girêdayî heye. Yê kurd der tî ser darê, yê tirk, li ber kerê disekine, yê ecem jî li ber hêwz disekine.

Turîkê xwe tîjî dikin xwediyê baxçe li wan demançeyê dikişîne ku bikuje. Yê kurd li ser darê dengê xwe wekî çivîkan dike û dest bi strandîne dike. Yê ecem xwe diavêje nava avê dengê werdeka derdixe. Yê tirk jî li ber kerê disekine wekî keran deng derdixe.

Xwediyê baxçe dipirse:

- Hûn çî dikin

Yê kurd bersiv didê dibêje:

- Ez bilbilê vê darê me

Guleyekî berê dide dikuje, dibêje:

- Jixwe ez dijminê bilbilan im.

Yê ecem dibêje:

- Ez werdeka vî hewzî me

Guleyekî jî berê wî dide, wî jî dikuje dibêje:

- Ez ji werdekan jî hez nakim

Dizivire yê tirk

- Tu çî yî?

- Ez çeşîka vî kerî me

Xwediyê baxçe

- Ê kurê kerê ker nêr e

Yê tirk dibêje:

- Diya min miriye ez bi bavê xwe re digirim. Bi vê gotinê canê xwe xelas dike.


XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (31)

XAÇEPIRS

Ş	R	K	L	T	U				
P	E	E	S	T	G	E	H		
S	O	L	T	R	A	R			
L	I	B	E	R	Y	A	A	S	A
D	A	M	A	M	A	Z	O	N	
Z	E	R	A	R	X	A	T		
K	A	S	A	T					
K	U	L	A	V	O	R			
R	E	A	I	L	E				
I	D	M	A	N	E	T			

Cureyekî hespan	Welatek li Afrîkayê	Rêxistîne-ke îrlandî	Hêrangeh	Dua	Bêdera Gemtîyan
Navgîna ristîne	Zewaca jînan		Dijî na	Gelo	
		Kon			
		Yar			
Mehmet... (wêne)				Ne bejî	
Mam				Dijî 'erê'	
	Yezdaneke Sumerî		Vegetan-dekek Bajarekî kevnare	Amerîk anyûm	
				Polîsê nazî	
Azar		Sodyûm		Perzemînek	
Eşîr		Avaker			
	Lib			Xwedayek	
	Dîn			Pêçan	
Bijûn					
Keser				Qertafek	
			Welidî	Beyreq	
				Bi tirkî seg	
Navê Agîrî yê kevin	Egoîzm				
				Tipek	




Bersiva Xaçepirsa 29'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 31'an pirtûka Cefîlê Cefîl "Elî Newêrek" e. **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Kesên ku xelata xaçepirsa 29'an, kitêba **Mustafa Borak "Gotinê Pêşiyên Kurda"** qezenc kirine: **Yıldız Oktay/ Mersin, Şilan Selçuk/ Antakya, Vahit Aydın/ Kartal, Ferzende Bozkurt/ Antep, Hüseyin Demir/ İstanbul, Hêlin Doğan/ İskenderun, M. Salih Turan/ Batman, Abdullah Özcan/ Adana, Yasin Güler/ İstanbul, Halil Katar/ Batman**

PEYVA VEŞARÎ





**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Başın ve  
Yayincılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Gefinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMİ TAN  
RAHMÎ BATUR

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13  
ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERÎTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimîndeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:  
Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost  
Helîm Yûsiv  
963-21-960099

Berlin:  
Silêman Sîdo  
49-30-69002695

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
Remzi İlhan  
312 06 32 31 28

Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

# Abiyayîşê Televîzyonê Medî

**M**a û Televîzyonê Medî çewreş û panc rocî cê ra ciyayî bî, dûrî mendî. Hesret û bêrî 45 rocî qediya û ma ancî re-say pê. Wexto qalê akerdîşê televîzyonê-kew kurdî bî, joy bawer nêkerdene. La ew çiyoy ku joy bawer nêkerdene bî rastî. Zew ku şima zî zanê Televîzyonê Medî, di hîrîşê aşmey adarî 1995'na de roc hîrê saetî dest bi weşanê xwi yo tecrûbî kerd.

Di panciyê aşmey gulânî 1995'na de zî dest bi weşanê xwi yo normal kerd. Televîzyonê Medî bi hîrê zaravayanê kurdî, tirkî, asûrî-suryanî û erebî weşanê xwi vi-la kerdene.

Weşanê MED-TV seranserê Ewrûpa de, Rohhilato Miyamîn de, Bakurê Afrîka û Kafkasya de temaşe bîne. Televîzyonê Medî televîzyonêkew alternatîf bî. Xeber û nû-çeyêkey televîzyonanê sermayedaran nê-dayne û şarî ra limitêne, dayne û eşkera kerdene. Televîzyonê Medî çim, goş û zîwanê miletey ma û şarê bindestî bî. Xapênayîş, manîplasiyon û propagandayê televîzyonanê cengê taybetî meqlûb kerdene, vernî ro ci girotêne û rastiya ku dewlete waştêne bilimno, resnayne temaşekerdaxanê xwi.

Televîzyonê Medî zilm û îşkencey dewlete, vengkerdiş û veysnayîşê dewanê Kurdistanî, kiştîş û qetliamanê kontregerîlayî eşkera kerdene, ma û dinya pê hesnayne. Hendî dewlete çîqa biwaştêne zî nêşkayne sûc û fiêlanê xwi bilimno. Televîzyonê Medî ancî miyanê her çar perçanê Kurdistanî de ruhiyetêkew milî, neteweyî viraştêne, sînorê ku neyaran miyanê Kurdistanî de antê, viraştê dartênêwe û mezg û zerey Kurdan de joytî Kurdistanî viraştêne.

Rol û fonksiyono ku Televîzyonê Medî ardene ca, dewlete tersne, qerefna. Bi qey a joy zî, rocê abiyayîşê televîzyonê Medî ra heya eyro dewleta tirke çî dest ra hame, teksîr nêkerd. Eyşt serê keyan, serê qehwan parabolî, antenê çanaxî sikitî. İnanê ku Televîzyonê Medî temaşe kerdene hamey gi-

**Bi qey ku merdim bi eşko heq û hiqûqanê serê kaxidî û peymananê miyanê dewletan ra îstifade bikero, lazim o merdim bibo wahîrê qewetî. Eger merdim wahîrê qewetî nêbo û paştay merdimî xurt û zexme nêbo jo hesabê merdimî nêkeno û qîmet zî nêdano.**

rotîşî, hamey îşkence kerdişî, kewtî hefsan. Dewlete antî propagandayêka bê sînore kerde. Vatêne: "Televîzyonê Medî vengê PKK'î yo, emir û talimatdan danê merdimanê xwi, televîzyonêkew terorîst o." Homa zano kam terorîst o.

Şima zî zanê kam dewan veysneno, kam însananê ma gêno, îşkence keno, kişeno û keno vinî. Enî heme çî qîm nêkerdî, dewleta tirke şî xwi est dewletanê emperyalîstan. İnan ra va: "Lazim o ma hetê jobînî bikerin û ma têdir Televîzyonê Medî bigîrin. Bi qey ku zirar reseno ma hemina." Henî dewletî zî bi îhale, ruşwet û peran hamey îkna kerdişî. Wezaretey karê teberî û heme konsoloxaneyê dewleta tirke hemberê Televîzyonê Medî kewtîbî seferberî, heya bire-so tehdît û şantaj heme îmkanê xwi bi kar ardî.

Di peynî de bi alîkarî û hetkerdişê çende dewletan (şima ê dewletan şinasnanê) televîzyonê medî 45 rocî hame girotişî. Dewlete bi rojname û televîzyonanê xwi da def ro, roşan kerd. Xwi ra şî û zafer îlan kerd. La zaferê înan zehf nêramit. Zaferê înan heme beme 45 rocî bil zaferêkew ercan. Dewlete nika zî wazena televîzyonêkew kontra akero.

Di enî 45 rocan de, miletey ma, şarê ma bi hezaran telefon kerd, faks kerd, qertî û mektûbî şirawitî. Eno zî îspat keno ku miletey ma, şarê ma çîqa wahîr ro televîzyonê xwi vecêno û te ra hes keno. Nizdbiyayîş û wahîrveciyayîşê şarê ma qewet û moral da xebatkar û mesûlanê televîzyonî. İnan zî vatîş û wazîfey xwi bi ca ard. Bi xebatêka xurt û zexme badê 45 rocî, di 15'ê gelawêjî de bî a û zey bombeyeke guna dijimîni ro. Abiyayîşê Televîzyonî Medî di 15'ê gelawêjî de wahîrê manayêka pîl a. Ew tarîxê miletey ma, şarê ma ku hacêr şîne, ver bi

qedyayîş û çînêbiyayîş şîne bi 15'ê gelawêjî hame meqlûb kerdişî û enka hacêr şino, beno berz. Gerek ma nêkerin xwi ra ku televîzyonê ma bi xwi zî netîce û berhemêkew 15'ê gelawêjî yo. Bi enî munasebetî 15'ê gelawêjî reyna ro miletey ma, şarê ma pîroz bo, bmbarek bo. Bi hurmet ma şehîdanê şoreşê Kurdistanî bi vir anê û heya bi heya ma go minetdarê înan bin.

Di gelêke peymananê miyanê dewletan de hamewo vatîşî û îmza kerdişî ku hergû miletey heqê ay. esto ku zîwanê xwi, kulturê xwi bi rey rojnaman, radyo û televîzyonan raver bero.

La şima bi xwi, pratîk û pîrêzey xwi ra zanê ku neyarê ma nêverdenê ma enî heq û hiqûqan bi kar biyarin. Bi qey ku merdim bîşko heq û hiqûqanê serê kaxidî û peymananê miyanê dewletan ra îstifade bikero, lazim o merdim bibo wahîrê qewetî. Eger merdim wahîrê qewetî nêbo û paştay merdimî xurt û zexme nêbo jo hesabê merdimî nêkeno û qîmet zî nêdano. Çunkî menfîetê henî dewletan heq û hiqûq ra ver yeno. Bi qey ena joy zî lazim o ma heme hetan de, heme waran de xwi xurt bikerin û joytî xwi ya neteweyî virazin. Miletey ma eşkera enî 45 rocî girotişê Televîzyonê Medî ra zehf dersan veco.

Televîzyonê ma bî a, la ma zey dewleta tirke nêdanê def ro û zafer îlan nêkenê. Ma zanê ku zaferê ma yo rastîn, kînga Kurdistan xelesya, rizgar bî, ma televîzyonê xwi berd Diyarbekir açaxî yo.

Di peynî de ez wazena vacî; heya gerîlayê ma yê qehremanî serê koyanê Kurdistanî de bê, heya ena miletey ma paştay ma de bo û wahîr ro şoreşê xwi veciyo go Televîzyonê Medî zî akêrdebo û di xizmetê şima de bo.

ROBÎN REWŞEN



# Çiyayên Mazî

## û tasek ava cemidî



Welatê me ne tenê ji aliyê cografîk ve, her wiha ji aliyê eserên dîrokî ve jî zengin e. Dêra Zehêran yek ji wan eseran e ku li Mêrdînê ye.

Wekî tê zanîn, li rojhilatê Mêrdînê an li bakurê Nîsêbinê çiyayê Bagokê heye. Ji çiyayê Bagokê û hetanî nêzikî Qerejdaxê di nexşeya cografî de dibêjin masûrên Mêrdînê. Ji çiyayê Bagokê û bi rojava ve çiyayên Mêrdînê dest pê dikin, li vê herêmê jî, çiyayên Xursê, çiyayên Ewênan û çiyayên Siltanşêxmûs an Şêxan hene. Ev çiya jî bi taybetiyên xwe bi nav û deng in û hemû cihê şêr û şehîdan e.

Li Şêxan ziyaretgehek heye, Ziyareta Siltanşêxmûs. Ew gelek nav daye li herêmê. Ji herêma Amed, Mêrdîn û derdorên wê, gel tene vê derê; ji bo ziyaretê û bêhnvedanê. Çiyayên Ewênan jî bi taybetiyên xwe navdar e. Wekî di nav gel de tê zanîn, piştî têkçûna serhildana Agiriyê, malbata Seyidxanê Ker, ji refan diqete û xwe nade destê dewletê û berê malbata xwe dide Sûrî. Dema tê çiyayên Ewênan, leşkerên romê pêşiya wî digirin û şer dikin. Hin kes jî malbatên wî dibêjin: "Ka emê alikariyê ji van gundan bixwazin."

Ew dibêje: "Na, vê devera cihê 'Çi min jê yo' ye. Û li vê herêmê şehîd dibê. Gora wî jî li nêzikî gundê Ewênan, li Zonê ye.

Li vê herêmê, jî cihê şênkahî pir in. Wekî Zanrê, Baqustan, Zonê û hwd.

Ji çiyayên Şêxan û herêma Xursê û pê ve, çiyayên Mazî dest pê dikin. Çiyayên Xursê jî gelek navdar e. Hemû çem û kanî ne. Bax û baxçeyên vê herêmê pir in. Titûna Xursê li herêmê bi nav û

deng e. Gelek şikeft û teht û zinarên hejayî temaşekirinê û ditinê, hene li vê deverê. Ava ku ji kaniyên Xursê tene der, wekî ava cemedê ye.

Ji Xursê û rojava çiyayên Mazî hetanî Dêrikê dom dikin. Li vê herêmê jî gelek deverên xweş hene. Li van çiyayên bi taybetî darên mazî û berî hene. Ew darên mazî, navên xwe li vê herêmê kirine. Navê çiyayên Mazî jî, li du navçeyan hatiye danîn, Dêrika Çiyayê Mazî û

**Li vê herêmê jî gelek deverên xweş hene. Li van çiyayên bi taybetî darên mazî û berî hene. Ew darên mazî, navên xwe li vê herêmê kirine. Navê çiyayên Mazî jî, li du navçeyan hatiye danîn; Dêrika Çiyayê Mazî û Mazîdax (Şemrex).**

Mazîdax (Şemrex).

Darên mazî ku berikên wan berûyên mazî ne û ev berû jî bo çêkirina meşkan bi kar tînin. Hin jî di pişeya çerman de bi kar tê. Berekî darên mazî din jî heye, ew jî şeqelor e. Ev şeqelor jî, ji bo hinek dermanan tene firotin.

Taybetiyeke darên mazî û darên berî din jî heye ku, ew jî jê re dibêjin 'gezo'. Tehma gezo nêzikî hingiv e. Berê, gelê vê herêmê pir didane hev û din. Gezo jî pelên çilo yên darên berû û mazî çêdibe. Wekî xulolîkan jî çilo dertê.

Gezo; wekî di nava gel de jî tê zanîn, hew li Kurdistanê tenê heye. Ev jî taybetiyeke çiyayên Mazî û Kurdistanê ye.

Wekî cografyaya Kurdistanê li çiya-

yên Mazî jî gelek cihê xweş û balkêş hene. Wekî Neqeba Zehêr, Tehtên Aqûbiyê, Hezazên Bêbînî, Tehtê Pozê Qîza Qrêl (Mencelê).

Ev tehtê Mencelê pir bilind e. Di nava gel de der heqê vî tehti de wiha tê gotin: "Lawê qrêl çûye ser vê latê û gotiye: 'Heke ez bikevim ezê herim heta beriyê (Berika Mêrdîn)."

Wekî Hezaza Bilako; dibêjin ev hezaz pir kûr in. Ev hezaz li vê herêmê ge-

riye. Refekî şervanên azadiyê û leşker li vê derê şer dikin. Gelek leşker û 7 heb şervan tene kuştin. Ev şer bi helbestekê tê gotin di nava gel de.

*Çiyayê Tûrcel darên Mazî  
Sheval Mahmut dikir gazî  
Armanca me ye serxwebûn  
Riya me ye serfirazî.  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan  
Ji bo te me canê xwe dan.  
Serê Xabê wê hilşînin  
Gur gur eskeran dikişînin  
Meytê Mahmut ewê binî  
Li pey panzeran bikişînin.  
Ax Kurdistan, ax Kurdistan  
Ji bo te me canê xwe dan*

Li başûrê Dêrikê, Beriya Mêrdînê heye. Ev berî jî Nîsêbinê dest pê dike û hetanî Qoser, Wêranşar, Serêkaniyê û heta Ruhayê (Heranê) dihere.

Ev deverên ku heta niha me qalê kir hemû li başûrê çiyayên Mazî dikevin. Bakurê çiyayên Mazî jî pir xweş e. Bakurê çiyayên Mazî jî gundên Şemrexê û navçeya Şemrexê pêk tê. Li vê herêmê jî gundê şênahî, çem û şikeftên xweş, xweşik hene. Kaniyên vê derê jî, avê xweş û cemidî jê tê der.

Li vê deverê Çemê Reşan heye. Li dora vî çemî hemû xweşikiya xwezayê li ber çavên mirov in. Ev der cihê bêhnvedanê ye, ku pir bi nav û deng e. Hetanî Mêrdînê, Amedê tene vê dere gerê. Çemê Reşan di gundên Çimarê re derbasî ser Dicleyê dibê. Li ser vî çemî Berdava Gökşu jî heye.

Çemê Reşan jî û çiyayên vê derê, wekî çiyayên Kurdistanê bûye cihê şêr û şehîdan. Hin li bakurê Çemê Reşan, li ser rîya Mêrdîn û Amedê Kela Zêrzem heye. Keleke dîrokî ye. Di dema Serhildana Şêx Seîd de jî aliyê dewletê vî hatiye bikaranîn. Gelek mirovên kurdê vî kelê hatine qetilkirin.

Di nava gel de tê gotin ku, kel li serê kolik e; ji serê kolik û hetanî binê newalê riyek heye, di bin erdê de ye. Dema şerê mezin (dema osmanîyan) mirovê li kelê diman, di vê riyê de tene heta newalê avê dibin û dişa diçûne ser kelê.

Wekî me got ev dever jî bûye warê şêr û şehîdan. Helbestek li ser van şerên ku li vê herêmê çêbûne di nav gelê vê derê de tê gotin.

*Çemê Reşan çemê me ye  
Serêkaniyê warê me ye  
Hêza me artêşa me ye  
Kurdistan welatê me ye.*

Taybetiyeke çiyayên Mazî ya din jî ev e; nêzikî Şemrexê, li gundê Şemika madena fosfatê heye. Ev fosfat wekî din li tu deverê Tirkiyeyê û herêmên din tune ye.

ÇIYA MAZÎ